Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1339 | 4-Çile-2026 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218


# Sê jinên têkoşer Sêvê, Fatma û Pakîze bûn dengê berxwedanê

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Her sê siyasetmedarên jin ên ku dema hewl didan ji Taxa Karşiyaka ya Silopiyayê ber bi Taxa Yeşîlyurtê ve biçin di 4'ê çileya 2016'an de, hatin hedefgirtin. Endama Meclîsa DBP'ê Sêvê Demîr, Endama KJA'yê Fatma Uyar û Hevseroka Meclîsa Gel a Silopiyayê Pakîze Nayir in.**

Di 4'ê Çileya 2016"an de, li navçeya Silopiya Şirnexê, endama Meclîsa Partiya DBP (Partiya Herêmên Demokratîk), Fatma Uyar, çalakvana HDP (Partiya Demokratîk a Gelan) û KJA (Kongreya Jinên Azad) Sêvê Demir û hevseroka Meclîsa Gel a Silopiyayê Pakize Nayir, dema ku hewl didan ji taxekê derkevin ku ji aliyê hêzên ewlehiyê yên dewletê ve hatibû valakirin, bi êrîşeke hovanê bi giranî birîndar bûn. Piştî ku cihê wan ji rayedaran re hate ragihandin da ku ambulans were şandin, ji aliyê hêzên ewlehiyê yên dewletê ve hatin gulebarankirin û kuştin. Dewleta Tirk jiyana jinên ku di refên herî pêş de cih digrin û têkoşîna azadiya jinan dimeşînin hedef digre, di êrîşan de rasterast beden û nasnameyên jinan tên hedefgirtin, rêbazên di van komkujiyan de tên bikaranîn jî nîşaneya nefreta li dijî têkoşîna jinan e.

**Sêvê Demir Çalakvana ku baweriya wê bi azadiya jinan hebû**

Sêvê Demîr wek çalakvaneke siyasî derket holê, jiyana xwe ji bo rêxistinkirin û parastina azadiya jin û civakê feda kir. Ew bi rola xwe ya çalak di tevgera siyasî ya Kurd de û baweriya xwe ya kûr bi felsefeya rizgariya jinan û pêwîstiya beşdarbûna wan di biryardanê de dihat nasîn.

Sêvê Demir di sala 1974"an de li gundê Sute yê navçeya Savur a Mêrdînê, li başûrê rojhilatê Tirkiyeyê ji dayik bû. Di salên 90'î de koçberî Manîsayê bû. Paşê, Sêvê biryar da ku Manîsayê jî biterikîne, ji ber ku nikarîbû li hemberî cudakariya nijadperest a li dijî nasnameya xwe ya Kurd bisekine. Sêvê di sala 1997'an de li nava Baskê HADEP'ê yê Jinan ê Manîsayê cih girt. Weke pêşenga rûken a têkoşîna azadiya jinê, heta kêliya dawî bi bawerî û biryardarî têkoşiya. Herwiha xebata xwe ya siyasî de, pêşî bi awayekî çalak beşdarî xebata jinan bû û li Enqereyê, paşê li Amed, Konya û Mêrdînê xebata siyasî meşand. Di sala 2005"an de di damezrandina Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk) de jî cih girt. Di sala 2009"an de li Nisêbînê hate girtin. Sêvê, ku birin girtîgeha tîpa E ya li Dîyarbekirê, di grevên birçîbûnê yên 2012"an de jî beşdar bû. Piştî ku ji girtîgehê derket, di sala 2014"an de wekî endama DBPê di karên siyasî de roleke çalak girt ser xwe. Di dema pêvajoyên xwerêveberiyê de, li navçeya Silopî ya Şirnexê jî beşdarî çalakiyên partiyê bû. Û di 4'ê çileya 2016" de li navçeya Silopiya Şirnexê bi hedefgirtina dewleta Tirk şehîd ket.




**Fatma Uyar bîranînek nayê jibîrkirin**

Fatma Uyar yek ji çalakvanên Kurd e ku roleke girîng di xebata siyasî û femînîst de lîstiye. Ew di tevgera femînîst a Kurd de çalak bû û beşdarî bilindkirina dengê jinên Kurd di forumên navneteweyî de bû, parastina dozên azadî û mafên mirovan. Fatma Uyar di 28"ê Tebaxa 1988"an de li gundê Duhokê yê li derdora Gabarê ji dayîk bû. Piştî jidayikbûna Fatmayê, malbata wê koçî navenda Şirnexê kirin, Di salên 2000"an de, Fatma bi tevgera berxwedana siyasî ya li wir nas bû û tevlî wê bû. Wê di destpêkê de wekî endamek çalak a tevgera ciwanan xebata xwe domand. di Di sala 2009"an de cezayê girtîgehê lê hate birîn û li girtîgeha Mêrdînê de bû, piştî salek û nîvek li wir derbas kir, hate veguheztin girtîgeha Sêrtê. Heta serbestberdana wê, wê 3.5 sal li girtîgeha Sêrtê ma. Piştî serbestberdana wê di sala 2010"an de, ew vegeriya xebata siyasî û herî dawî di xebata KJA yê de cih girt.
Fatma Uyar, ku berî 9 salan ligel Sêvê û Pakîzeyê li Silopiyayê hat qetilkirin, yek ji wan Kurdên ku ji zarokatiya xwe ve terora dewletê dîtiye bû. Beşdarbûna wê ya têkoşînê di temenê ciwaniyê de dest pê kir. Ew hat binçavkirin, girtin, lê qet dev jê berneda.

**Pakîze Nayir weke 'karkera jiyanê' tê nasîn**

Pakîze Nayir di sala 1990'an de li gundê Ziristan ê Silopyayê ji dayik bûye weke 'karkera jiyanê' tê nasîn. Zarokatiya xwe û tevahiya jiyana xwe li Silopiyayê derbas kir. Ji aliyekî ve Pakîze xwedî li malbata xwe derket û ji aliyê din ve jî nikarîbû têkoşîna berxwedanê paşguh bike û beşek ji tevgera azadiya Kurd bû. Di temenê xwe yê ciwan de beşdarî kar û çalakiyên siyasî yên jinan bû. Bi vekirina saloneke porê debara malbata xwe kir û di heman demê de wekî hevseroka Silopiyayê her erk girt ser xwe. Û di 4'ê Çileya 2016"an de, li navçeya Silopiya Şirnexê de wê ji ber êrîşeke hawanê jiyana xwe ji dest da.

## Gotina Dawî



### Xelkê Sûriyê û sala nû!

Mihemed Seydi

Ji sala 2011'an ve qale aloziya li Sûriyê hat kirin ku xelkê Sûriyê jêre got şoreş. Ev serhildana ku bi çalakiyên xelkê dest pê kir û banga jiyaneke bi rûmet kir, bi destwerdana hin aliyên wek Tirkiya veguherî şerê navxweyî yê bi sedema wêranî û koçberiya bi milyonan xelkê sûriyê. Herwiha Rêjîma Baas jî ku navê her kesê bang dikir da zilm bi dawî bibe bi terorist bi nav kir û navê wan kir terorist û wiha agir bi her deverê ket. Pirî caran xwestin Kurdan jî bixin nava wî şerê navxweyî, lê helwesta xeta sêyemîn a ku tenê xwe li dijî êrişên ji derve biparêzin û xwe di aliyê siyasî, civakî û leşkerî de bi rêxistin û bi hêz bike serwer bû. Kurdan dest ji vê xetê berneda û ev jî bû sedem, destpêkê gurûpên bi navê Artêşa Azad û paşê Cubhet El-Nusra û piştre jî DAIŞ, êrişî wan bikin. Rêjîma Baas ku ji xwe re li vê rewşê tamaşe dikir û carne jî sor dikir da Kurd zeif bibin û gurûpên din jî bi dawî bibin, dewleta Tirk jî bi desteka hin welatên Kendavê yên weke Qeterê gurûpên navborî bi çek û pere kirin da him Kurdan tune bikin û yên mayî jî mejbûr bikin ku tevlî şerê navxweyî yê li Sûriyê bibin. Lê Kurd li ser ya xwe man û hemû gurûpên din tasfiye bûn û rêjîm jî hilweşiya. Wekî hêza sereke li ser erdê, îro QSD'ê maye û li aliyê din gurûpên HTŞ'ê ku beşek ji wan tunderewên biyanî ne û hin gurûpên çete û diz yên ser bi Turkiyê ve ku navê Artêşa Wetenî ya Sûriyê li wan tê kirin e. HTŞ'ê ku li Şamê niha desthilate û hikumeta veguhêz a Sûrî ava kiriye, ji wê be bi rûniştina li Koşka serokkomariyê, ew ê heta hetayê li ser desthilatê bimînin û milet mejbûr bimîne wan qebûl bike. Lewma destpêkê xwestin çavên Elewiyan li beravên Sûriyê bişkînin û paşê derbekê li Swêdayê li Durziyan bidin da rê vebikin Kurdan jî li bakur û rojhilatê Sûriyê tune bikin. Lê ne Elewiyan serî danî û ne Durzî teslîm bûn û ne jî Kurd ji ya xwe hatin xwarê. Berovajî wê, tevî zextên pir zêde, di rojên dawî yên sala 2025'an de Elewî bi hezaran daketin qadan û banga Federaliyê û mafê xwerêvebirinê kirin. Van xwepêşandanan, desthilata li Şamê şaşûmaş kir. Ji wan be êdî Elewî wê dengê xwe jî dernexin, lê herkes li kolanan bû. Ji ber tu ferq di nava desthilata Baas û ya HTŞ'ê de tune, çawa 2011'an de êrişî xelkê hat kirin, 2025'an de jî êrişî Elewiyan hat kirin. Ev yek jî hîne nêrîna sîstemeke Federal a nenavendî di mêjîyê xelkê Sûriyê de bi cih dike. Ji ber yên ku ji wan re dibêjin desthilata demkî, ku ev saleke li ser koşkê ne, wekî dîktatoriya Baas a çil salî desthilat bû tev digere. Lewma, Ji beravê Elewî, ji Swêdayê Durzî, bakur û rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser û li herêmên din kesên Demokrat, rêjîmeke cêwiya Baas lê bi Kirasê şerîeta Îslamê qebûl nakin û di vê xalê de yeknêrîn û helwestin. Ev jî dibe sedema aciziya radîkal, cîhadist, Baas'îyên berê ku niha ketine nava desthilata nû û her roj li ser dezgehên Çapemeniyê êrişî dikin û kîn û nefretê di nava gelê Sûriyê de belav dikin. Sala 2025'an de ev siyaseta van aliyan û dewletên li pişt wan ,bi hemû rengê tundiyê, li hember xelkê Sûriyê negihîşt encamê, lê gelo gotina Sûriyan di vê sala nû de wê çawa be? Gelo sala nû wê ji bo Xelkê Sûriyê nû be?

## Sudoku:Pirs 71

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | | | | 1 | | | |
| | | | | 2 | | | 7 | |
| | | 8 | | | 4 | 6 | 1 | |
| 1 | 8 | | | 3 | 9 | | 5 | |
| 5 | | | | 7 | | | | 2 |
| | 2 | | 1 | 4 | | | 8 | 6 |
| | 7 | 1 | 4 | | | 9 | | |
| | 4 | | | 9 | | | | |
| | | | 5 | | | | 3 | 4 |

## Sudoku: Bersiv 70

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 9 | 3 | 8 | 1 | 2 | 5 | 4 | 7 |
| 5 | 4 | 8 | 6 | 7 | 9 | 1 | 3 | 2 |
| 7 | 1 | 2 | 5 | 3 | 4 | 9 | 8 | 6 |
| 9 | 8 | 1 | 3 | 2 | 7 | 4 | 6 | 5 |
| 2 | 3 | 5 | 1 | 4 | 6 | 7 | 9 | 8 |
| 4 | 6 | 7 | 9 | 8 | 5 | 2 | 1 | 3 |
| 8 | 7 | 4 | 2 | 9 | 3 | 6 | 5 | 1 |
| 3 | 5 | 9 | 7 | 6 | 1 | 8 | 2 | 4 |
| 1 | 2 | 6 | 4 | 5 | 8 | 3 | 7 | 9 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji stûyê xwe deranî/ji stûyê xwe derxist:**
- Dayê.
**Ji xwe daxist:**
- Xwe kêm kir; kêmayî qebûl kir; stûyê xwe xwar kir.
**Ji ya xwe ket:**
- Bi heman wateyê.
**Ji ya xwe daket:**
- Bi heman wateyê.
**Ji ya xwe hat xwarê:**
- Di dîtina xwe de israr nekir.
**Ket ser min:**
- Gotina te rast derket; tu bi ser ketî; ez bûm deyndarê te.
**Lingê xwe li erdê xist:**
- Nîşan da ku wê wî karî bike.
**Milê xwe da ber:**
- Qebûl kir; girt ser xwe; got ezê bikim; got ezê bêjim.
**Serê xwe girt:**
- Hat qebûlkirin; cihê xwe girt.
**Singa xwe da ber:**
- Kar girt ser milê xwe; qebûl kir.
Xwe da ber:
- Bi heman wateyê.
**Xwe di ber re kir:**
- Bi heman wateyê.
**LI SER ÇAVLÊKIRINÊ**
Beqê çav da çêlekê, zikê wê teqiya:
- Çav li yê ser xwe re kir, zerereke mezin dît.
**Çav dayê:**
- Weke wî kir; ka wî çi kir wî jî wisa kir.
**Çav kutan hev:**
- Yekî çi kir yê din jî wisa kir; çav dan hev.
Çûk e diçe li ser hêkên betan rûdine.
- Dema yek dixwaze weke yek ji xwe mezintir bike û bi ser nakeve, hingê tê gotin.
**Golik e, diçe li cem ga rîx dike:**
- Ew bixwe piçûk e, lê xwe tîne qama yên mezin.
**Lawikê Ingolî, nabe cindiyê Stenbolî:**
- Bi teqlîdê mirov nabe weke xelkê; divê mirov ji xwezaya xwe dernekeve.
(Ingol navê gundekî Bidlîsê ye)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Di bin navê xwekuştinê de kuştina jinan rewa dikin




Zihniyeta zayendperestî xwe didomîne, hişmendiya mêrê serdest di bin navê xwekuştinê de kuştin û hovîtiya li ser jinê rewa dikin. Di sala 2025'an de ji ber tevliheviya ku li Sûriyê tê jiyankirin kuştin û destdirêjiya li ser jinê zêde bûye.**R-2**

## Li Îranê di xwepêşandanan de 8 kesan jiyana xwe ji dest dan




Di protestoyên gel yên ku Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ji ber krîza aborî ji heft rojan ve hatiye destpêkirin de, ji aliyê dewletê ve zarokek û 7 kesan jiyana xwe ji dest dan.**R-6**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1339 | 4-Çile-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S




## Yek ji sûcên dijmirovî li Sûriyê; Firotina Jinên Elewî

Piştî bûyerên Berava Sûriyê û komkujiyên ku li dijî Elewiyan pêkhatin, bi dehan jinên Elewî ji aliyê çekdarên girêdayî hikumeta veguhêz ve hatin revandin. Li gorî hin raporan nêzî 250 jinên Elewî yên li Girtîgeha Harim'ê girtîbûn, bi tora ku li bernameya Sîgnalê hatiye organîzekirin, hatine firotin.**R-3**



## Ferzkirina dorpêçê ne polîtîkayeke nû ye

Dorpêça domdar a ku li ser her du taxên Kurdan yên Helebê tê ferzkirin, bandora xwe li ser qada perwerdê, tenduristî û xizmetguzariyê kiriye. Hevserokê Komîteya Perwerde û Hîndekariyê ya Helebê Şiyar Silêman da zanîn ku her çendî rewş zehmet bibe wê deriyên dibistanan neyên girtin.**R-7**

## 'ÇARESERÎ BI GUHERÎNA QANÛNAN PÊKAN E'

Hevberdevkê Komîsyona Têkiliyên Derve ya Partiya DEM'ê Berdan Ozturk da zanîn ku desthilatdariya Tirkiyê di derbarê pêvajoya aştiyê de gelek tiştan dibêje lê gotinên xwe bi cih nayîne, ew dixwaze li gorî berjewendiyên xwe yên siyasî gavan biavêje, ne li gorî berjewendiyên gel û civakê. Ji bo serxistina pêvajoyê pêwîst e dewlet daxwazên civakê ji bo pêkanîna edalet, wekhevî , demokrasî û azadiyê paşguh neke, herwiha pêwîst e mafê hêviyê pêkwere û Rêber Abdullah Ocalan azad bibe, çareserî wê bi guhertina qanûnan pêkan be.R-4








## Rêveberiya Xweser ewlebûn ava kir, hikumeta veguhêz êriş pêş xist



Nûnerê Rêveberiya Xweser a li Welatên Kendavê Sihanok Dîbo diyar kir ku piraniya gelên Sûriyê şêwazê Rêveberiya Xweser erê dike, wekî Sûriyeke nenavendî, demokrasî, pirrengî ku îradeya gel û pirrengiya wê misoger dike û got, "Ger sererastkirinek ji aliyê hikumeta veguhêz neyê kirin, wê hemû rê li pêşiyê bê girtin."**R-5**

## Ji Çiraxên Wêjeya Kurdî

Helbestvana Kurd Rûşen Yûsif ne tenê dengekî femînîst e di qada helbesta Kurdî de, lê yek ji awazên ruhê Kurdî ye ku naxwaze were vemirandin.**R-9**

## Ji navdêrên jinên Kurd; Meryem Xan



Hunermend û dengbêja kurd Meryem Xan, xatûn û şaha dengbêjiya kurdî ye, xwediya dengê zîz û zelal e, stûna dengbêjiya resen e. Meryem Xanê, di sala 1904'an de li gundê Dêrgolê yê girêdayî bajarê Şernaxa Bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye.**R-10**



**Çanda xwedawend**
İsyan Karadeniz R-2



**Bi `Defciyên` Qesrê Re Welat Nayê Birêvebirin!**
Idrîs Henan R-4



**Saleke Nû Bi Rojê re**
Sînan Cûdî R-6

# Di bin navê xwekuştinê de kuştina jinan rewa dikin

Zihniyeta zayendperestî xwe didomîne, hişmendiya mêrê serdest di bin navê xwekuştinê de kuştin û hovîtiya li ser jinê rewa dikin. Di sala 2025'an de ji ber tevliheviya ku li Sûriyê tê jiyankirin kuştin û destdirêjiya li ser jinê zêde bûye.

Stêrk Mihemed/Qamişlo




Di vê demê dawî de li tevahî cîhanê bi sedan jin hatin revandin, kuştin û bi tundiyên cûrbicûr re rû bi rû man. Herwiha li Sûriyê bi taybet komkujî û kiryarên dijmirovî di derheqê jinên Elewî û Durzî de hatin kirin, li herêmên di bin serweriya HTŞ'ê de kuştin û revandina jinan bû ye bûyereke ji rêzê. Di heman demê de li herêmên dagirkirî mîna; Serê Kaniyê, Girê Spî û Efrînê ku di bin dagirkeriya Dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî de ne destdirêjî û bê mafiya li ser jinên Kurd didome. Herwiha ji bo komkujî û zihniyata xwe ya paşverû eşkere nekin xwekuştina jinan didin pêş.

### Kuştina jinan hîn didome

Sala 2025'an bi sala kuştina jinan tê binavkirin, di vê salê de li seranserî cîhanê jin bi kuştin û tundiyê re rû bû rû mane. Zihniyeta serweriya mêr û bindestiya jin hîn xwe didomîne. Hişmendiya zayendperest ya ku xwe di nava hin civakan de kûr kiriye, kuştin û nedana mafê jinê rawa dibîne ji ber ku heya roja me ya îro ew kesên ku bi destê wan jinên Elewî û Durzî hatine qetilkirin, revandin û tecewîz kirin hesab ji wan nehatiye xwastin, ev yek jî dihêle ku xwe û wê zihniyetê bidomînin. Li herêmên di bin serweriya HTŞ'ê û dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê ve jin hertim di bin gefê û metirsiya revandinê de jiyan dikin. Herwiha bandoya zihniyeta DAIŞ'ê jî li hin kesan kiriye ku kuştin û tundiya li ser jinê ji rêzê dibînin.

### Şêrîn bû qurbaniya zihniyeta zilamtiya paşverû

Jina ciwan a bi navê Şêrîn Nûrî Oso ya ji gundê Aşkan a bajarê Cindirêsê yê Efrînê di mala xwe de, piştî hat îşkencekirin, bi guleyan hat qetilkirin. Malbata ji ber nebûna ewlehiyê û belavbûna li herêmê metirs e ku bûyerê eşkera bike. Temenê Şêrîn 19 salî ye, beriya 3 salan zewciye. Ev kiryarên dijmirovî ku li herêmên di bin dagirkirina dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî didome. Zewaca temenbiçûk digel nebûna mafê parastina jinan de belav e. Herwiha ji bo li ser bûyerê were tepsandin û kiryarên li ser jinên Kurd li Efrînê tên kirin were veşartin dibêjin xwe bi xwekuştiye (intîhar kiriye) .

### Ji dewletek dagirker hêvî nayê girtin ku mafê jinan biparêzin

Li Sûriyê bi taybet li herêmên di bin serweriya HTŞ'ê û dagirkeriya dewleta Tirk de mafê jinan nayê dîtin û cûdahiya zayendê tê dîtin. Di 2018'an de bajarê Efrînê ji hêla Dewleta Tirk û çeteyên wê ve hate dagirkirin. Li Efrînê komkujî li ser gel û xwezayê jî hate meşandin. Gelek kes hatin kuştin û revandin, di nava wan de gelek jin hene ku hatine revandin û heya roja me ya îro di zindanê de ne. Ji dema dagirkirinê û heya roja îro jin di bin gef û metirsiyan de jiyan dikin, ji ber ku rastî kuştin û revandinê tên. Dewletek ku bajarekî dagirdike û mafê wan weletiyan binpêdike, tu bawerî ji wan tune ye ku mafê jinan biparêzin. Di 2019'an de Serê Kaniyê û girê Spî ji aliyî dewleta Tirk ve hat dagirkirin, bi dagirkirina vê herêmê re ne tenê binpêkirin li ser bajar hat kirin, lê belê gelê wê herêmê bi kirkarên dewleta Tirk re rû bi rû man. Herwiha dîsa jî û ji ber hişmendiya zilamên ku hertin jinê bê hêz û kole dibîne jin bûn qurbaniya wê dagirkeriyê.

Di 8'ê Kanûnê de Rêjîma Esed hat rûxandin, di dema rêjîma baas de sîstemeke zayendî dihat meşandin ku hertin jin biçûk didîtin, lê piştî hilweşîna Rêjîma Baas HTŞ'ê bi seroketiya Ehmed Elşeri (Colanî) hate ser desthilatdariya Sûriyê. Tu guhertin di milê jinê de nehat çêkirin, lê belê hîn zêdetir binpêkirin li ser mafê jinan hate kirin. Li Berevê Sûriyê di bin navê ku bermahiyên Rêjîma Baasin, komkujî hate kirin, bi hezaran gelê Elewî hatin kuştin û revandin. Gelek jin hatin kuştin û hejmareke mezin jî hatin revandin û heya niha çarenosa wan jinan ne diyare. Dîsa jî heman kiriyarên HTŞ'ê li Siwêdayê hate jiyankirin, jinên Durzî hatin revandin, êşkencekirin û kuştin.

Di nava dewleta Sûriyê de qaşo ku tê gotin ku hukimete û dewlete jin cihê xwe têde nagirin û ne xwedî biryarin û eger hin jin niha şeklî hebin jî di bin zexta dewletan ku ew anîne ser desthilatdariyê ne. Niha jî hikumeta Sûriyê biryardaye ku mafê dayîkê di darîngeha zarokan de tune ye ango mafê wê di biryardayînê de tune ye. Ev sîstema ku niha tê meşandin sîstemeke radîkale.

### Jinan dikujin û radighînên ku wan xwe bi xwekuştî ye

Ji bo ku zihniyeta xwe ya paşverû li beranberî jinê bitepsînin û ji raya gîştî re neyê eşkerekirin, dibêjin ku wan jinan xwe bi xwekuştine. Ev bûyer li herêmên dagirkirî û yên di bin serweriya HTŞ'ê de rû didin. Gelek jin ji ber êşkenceya hevjîn, biya û bav tên kuştin, lê ji bo ev neyê eşkerekirin û hesab ji wan neyê xwastin dibêjin ku xwekuştiye. Dixwazin bi vê rengî kuştina jinan ji xwe rewa bikin. Zihniyeta zilamtî ku xwe mafdar dibîne ku jinê bikuje û êşkenceyê lê bike xwe didomîne. Herwiha dema ku hesab xwastin ji van kesan neyê kirin ev hişmendî hîn zêde belav dibe û kûrtir dibe.

### Zewaca bi temê biçûk kuştin ji jinê re ye

Zewaca temen biçûk tundiya herî giran li ser jinê ye. Jinê ciwan ya bi navê Şêrîn Osê ku li Efrînê hatiye kuştin di temenê 16 salê de zewicî bû, li gorî çavkaniyên xwecihî ev bi êşkenceyê re rû bi rû dima. Zewaca temênê biçûk badoreke mezin li ser jiyana jinên ciwan dihêle, ji hestên zarokbûnê bê par dimîne, ji xwendina xwe dûrdikeve, bandor li ser derûnî û fîzîka wê jî dike. Gelek bûyerên mîna ya Şêrîn li Sûriyê qewimîne, lê ji ber tirsê nehatine raghandin.

### Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jin bingeha civakê ye

Li Sûriyê û li gorî geşedanên ku tên jiyan kirin li herêmên Rêveberiya Xweser parasrina mafê jinê ji bingehîn destkeftiyên herêmê ne. Di asta fermandariyê de jin cihê xwe digirin û xwedî biryarin. Herwiha jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne tenê ji bo azadiya jinên Kurd têkoşînê didin meşandin, lê belê ji bo tevahî jinên cîhanê têkoşîn û xebatên cûr bi cûr didin meşandin. Herwiha cihê xwe di warê siyasî, civakî, diplomasî, leşkerî û reveberiyê de jî digirin.

**Akademiya Jîneolojî**

## Çanda xwedawend

İsyan Karadeniz

Pêvajoya derketina xwedavenditiyê de nasnameya jin li hemberê rastiya mêr wekê xolikkar û avakera hemû tiştan wekê afriner derdikeve pêş. Li vir berhema jinan wekê bilind kirin û pîroz dîtina jin heye. Nasnameya xwedawenditî nirxên pêşengiyê ne, ne tene wek baweriyê ye, pergalekî siyasî û huquqî ya civakê ye. Xwedawenditî razber e, nayê ditin lê rahibeyên xwedawendan hene ku pêşengtiya civakê dikin.

Nasnameya jin destpêkê de ne wek xwedawenditiyê ye. Di salên B.Z. 7.000- 10.0000 ê de di nava klanê de nirxekî jinê heye. Nasnameya xwedawenditî bi pêşketina neolitikê ve derdikeve.

Di mitolojiyan de ev wekê çirok tê ser ziman. Her civakekê xwedî çirokeki ye û dijberî ya van çirokan beramberî hev tune ye. Mitolojî bi xwe çirokên civakê ne. Mît tê wateya gotin, mitolojî jî zanista gotin ê ye. Dema ku xwedawenditî tê gotin tene jin nin e, heman demê di nava vê de mêrên ku hatine erkdar kirin jî hene. Di zêvaca pîroz de em vê rastiyê dibînîn ku mêrek bibe rêvebir an na bi êrîkirina jinan, rahibeya sereke ku di mitolojiya Sumeran de jî bi nave Enkî derbas dibe ve biryara vê tê dayin.

Hetta niha jî ev çand heye lê dest guhertiye, minak buye êrikirina papayê ve buyina qral e. Nasnameya bav jî nasnameyakî piştre derdikevê. Di zimana kevnar a Aryen de bav tê wate ya yê ku nan, xwarin tîne. Mafekî bav a ser zarokan nine, ger mêr bixwazibe rol û ristek di nava civakê de bilêyêze bi êrikirinê jin ve pêşdikeve.

Hem berî Neolitikê hem ji di pêvajoya Neolitikê de li hemberê jinê rêzgirtinek heye, bilindiyek heye. Ev di etimolojiya pêyva şîr ku heta roja iro bi têsire jî tê ditin. Helal kirina şirê dayikê, şîrê helal vexwarin û li ser şîrê dayikê sod xwarin. Di pêykerên xwedawendan heya niha hîna jî di nava civakê şopên zindî ya vê çandê ne. Heman demê gotina ya star, stargeh ku jî xwedawend İştar tê hîna jî xwe spartina parastina xwedawendan nişan dide. Çerxa jiyan, mirin û vejîn ê ku ji zikê dayikê heya gor kirina miriyan, xweza wek dayika duyem dîtin û pîroz kirina axê bi vê çandê ve girêdayî ye. Heta niha şopên bi vê awayî hene lê ev şop pir lêwaz buye. Em di hewldana zindî kirina wê çandê de ne.

Ji ber ku çanda xwedawenditî ne ku pêvajoyekê ku hatiye jiyan kirin û bi dawî buyê ye. Çanda ku damarên vê yên berxweder sopên xwe li pêy we hiştiyê ye. Em bandora vê çanda di nava civakê de di tekiliyên dayin standinê wek parve kirin, daxwaza wekhevî, şermezarkirina xirabî û hewldana avakirina xweş û baş de dibînîn. Her wiha civakên li dora jin dayikê wekê Mosuo ya Çînê, Minangkabau ya Endonezyayê, û Bribri ya Guatemalayê, Garo ya li Hindistanê, Nagovisi ya li Papûa Gîneya Nû yên ku bi nirxên xwezaya civakê jiyan dikin in.

Pîroz ditîn gelo çi tîne bîra me? Em ji çi tiştê re dibejin pîroz û ev pîrozbun çawa bi wate dibe? Pirsên ku gerek em di nava jiyana xwe de bersivan bigerin û ne tene jin; heman demê mêr jî çiqas ji vê çandê dûr ketiye mijarê xwe lêpirsin kirinê ye.



# Îsraîl bi Qibris û Yûnanistanê re pilaneke hevkariya leşkerî îmze dike

Hewildanên hevbeş di navbera Îsraîl, Yûnanistan û Qibrisê berdewam dikin. Di 28'ê Knaûnê de pilaneke hevbeş ya hevkariya leşkerî ya sêalî di navberan van welatan de hat îmzekirin.

Lîloz Hisên

Hewildana hevbeş a berdewam û berbiçav a ku ji hêla Îsraîl, Qibris û Yûnanistanê ve di gelek astan de, bi taybetî di asta leşkerî de, tê kirin. Bê guman peyamek zelal ji bo Tirkiyê nîşan dide, ku li aliyê dijberî van her sê welatan e. Ev hewldan, dibe ku di pêşerojek nêzîk an dûr de, bi hêzek hevbeş a leşkerî bigihêje lûtkeyê, mijarek ku jixwe tê nîqaşkirin û bi tevahî lêkolîn tê kirin.

Li gorî Rojnameya Jerusalem Post roja Yekşemê di 28'ê Kanûnê de ji Hêzên Parastinê yên Îsraîlê, ragihand ku Îsraîl, Yûnanistan û Qibrisê planeke çalakiyê ya hevkariya leşkerî ya sêalî ji bo sala 2026'an îmze kirine, ku armanca wê xurtkirina aramî û ewlehiyê li Rojhilatê Deryaya Spî ye. Ev însyatîf beşek ji hewldanên berfirehtir e ji bo astengkirina çalakiyên leşkerî û stratejîk ên Tirkiyê li Rojhilatê Deryaya Spî ye.

### Hevkariya leşkerî

Rojnameya Jerusalem Post diyar kir ku şandeya Îsraîlê bi serokatiya serokê Beşa Hevkariya Derve ya Hêzên Parastinê yên Îsraîlê, Tuggeneral Amit Adler, li Nîkosya bi hevalbendê xwe yên Yûnanî û Qibrisî re civiya. Plan tetbîqatên perwerdehiyê yên hevbeş, komên xebatê di warên cûrbecûr de û diyaloga leşkerî ya stratejîk li ser mijarên berjewendiya hevpar vedihewîne.

Îmzekirin di hefteya dawî ya Kanûnê de li Qibrisê hat kirin, lê artêşa Îsraîlê ev pêşketin roja Yekşemê di 28'ê Kanûnê de eşkere kir û rave kir ku îmzekirin gaveke din di kûrkirina hevkariya leşkerî ya di navbera welatên herêma Rojhilatê Deryaya Spî de temsîl dike.

### Hêzek ji bo bersiva bi lez

Di heman çarçoveyê de, malpera nûçeyan a Yewnanî "Tania" diyar kir ku konsepta ku ji hêla Îsraîl, Qibris û Yewnanistanê ve hatiye nîqaşkirin yekîneyeke ji nêzîkî 2500 leşkeran pêk tê, ku ji her yek ji Yûnanistanê û Îsraîlê 1000 leşker û ji Qibrisê jî 500 leşker hene.

Di 18'ê Kanûnê de, rojnameya Washington Post ragihand ku berpirsên payebilind ên Îsraîl, Yûnanistanê û Qibrisê li ser îhtîmala avakirina hêzeke bersiva bilez a ji yekîneyên ji artêşên her sê welatan pêk tê nîqaş dikin.

Sê çavkaniyan ji The Post re gotin ku ev înîsiyatîf beşek ji hewldanek berfirehtir e ji bo astengkirina çalakiyên leşkerî û stratejîk ên Tirkiyê li rojhilatê Deryaya Spî û destnîşan kirin ku ew ê ne yekîneyeke daîmî û sabît be, lê belê yekîneyeke ku dikare di demên krîzê de li ser erdê, li deryayê an jî li hewayê bi lez were belavkirin.

Li gorî Reutersê Hin berpirsên leşkerî yên Yûnanî û çavkaniyeke peybilind gotine ku, Yûnanîstan, Îsraîl û Qibris wê perwerdeyên hewayî û deryayî yên hevbeş li rojhilatê deryaya Spî di sala 2026'an dê berfireh bikin, da ku hevkariya parastinê xurt bikin.

Têkiliyên di navbera her sê welatên li rojhilatê Deryaya Spî de di deh salên borî de bi rêya perwerdeyên leşkerî yên hevbeş, kirîna çekên parastinê û hevkariya enerjiyê, xurt bûne. Ev pêşketin ji hêla Tirkiyê ve bi baldarî têne şopandin.

### Nameyek zelal ji bo Tirkiyê

Avakirina vê hêzê û heta tenê nîqaşkirina avakirina wê, armanc ew e ku peyamek ji Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan re bişîne. Têkiliyên Enqerê bi Til Ebîb, Nîkosya û Atînayê re di demên dawî de aloz bûne, ji ber şerên desthilatdariyê li Sûriye û herêma Meşreq Erebî ji bo Îsraîlê, kontrola li ser bakurê Qibrisê ji bo Qibrisê û nakokiyên sînor û deryayî bi Yûnanistanê re.

Tirkiyê dixwaze beşdarî hêza pirneteweyî ya li Xezayê bibe û bi her du hikûmetên ku pêvçûn di navbera wan de ye li Lîbyayê re hevdîtinan dike da ku peymanek nû ya deryayî danûstandinan bike. Ev gav dikare bihêle ku ew di qada deryayî ya bakur û rojhilatê Deryaya Spî de bibe lîstikvanek serdest.

Di 22'ê vê mehê de, Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu got ku Îsraîl, Yûnanistanê û Qibris li hev kirine ku hevkariya leşkerî û ewlehiyê di navbera xwe de berfireh bikin, di peyamekê de ku ji aliyên herêmî, bi taybetî Tirkiyê re hatibû şandin, bêyî ku navê wê bi nav bike.

Gotinên Netanyahu wê rojê di konfranseke rojnamevanî de hatin, ku wî ligel Serokwezîrê Yûnanistanê Kyriakos Mitsotakis û Serokkomarê Qibrisê Nikos Christodoulides li dawiya lûtkeyeke hevbeş a li Qudisê li dar xist.

Serokwezîrê Îsraîlê peyamek hişyariyê ya rasterast, her çend nav lê nehatiye dayîn jî, ji Serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdogan re şand û got: "Ji bo kesên ku xeyal dikin împaratoriyan ava bikin û erdên me kontrol bikin, ez dibêjim: Ji bîr bikin. Ev ê çênebe. Li ser vê yekê qet nefikirin."

Her wiha wî lê zêde kir û got: "Em pabend in û dikarin xwe biparêzin û ev hevkarî şiyanên me xurt dike. Bi hev re, wekî demokrasiyên li Rojhilatê Deryaya Spî, em ê ewlehî, serfirazî û azadiyê pêşve bibin."



### Hevkariyeke berdewam

Analîst balê dikişînin ser hevkariya nêzîk û berdewam a di navbera her sê welatan, Îsraîl, Qibris û Yûnanistanê de û têkiliya leşkerî ya di navbera Qibris û Îsraîlê de, ku ya paşîn dixwaze alavên leşkerî veguhezîne girava Rojhilata Navîn. Di salên dawî de, Îsraîlê gelek perwerdeyên hevbeş bi hêzên deryayî û hewayî yên Yûnanistanê û Qibrisê re lidar xistine, di nav de perwerdeyên sêalî jî hene. Li gorî raporên Yûnanistanê, pergala mûşekên Spike ya Îsraîlê ji qonaxa kirînê ber bi bicihkirina operasyonel di nav artêşa Yûnanistanê de ve diçe.

Li gorî weşanên cuda nîşan didin ku armanc ew e ku heta havîna bê, bi balkişandina ser bicihkirina li giravên rojhilatê Egeyê û herêma Çemê Evros, bi tevahî amadebûna operasyonel pêk were.

Li gorî raporan zelal dikin ku ev ne tenê bidestxistina mûşekên dûrin, lê di heman demê de yekkirina toreke berfireh a tam herwiha pergalên fermandarî û kontrolê jî vedihewîne, ku qidreteke mezin û giring dide yekîneyên biçûk.

### Enerjî û Aborî

Sektora enerjiyê kevirê bingehîn ê avahiya hevpeymaniya sêalî temsîl dike, ji ber ku ew berjewendiyên erdnîgarî û aborî yên her sê welatan yek dike. Îsraîl û Qibris xwedî keşfên giring ên gazê yên deryayî ne, di heman demê de Yûnanistanê rola deriyê bejahî yê bazarên Ewropî dilîze.

Her sê welatan siyasetên xwe yên enerjiyê hevrêze kirine, di çarçoveya Foruma Gazê ya Rojhilata Deryaya Spî de, ji destpêka damezirandina wê sala 2019'an de. Ev yek çarçoveyeke herêmî ye ku welatên Ereb û Ewropî di nebûna Tirkiyê de beşdar bûne, ku ev yek aliyek siyasî daye forumê ku ji platformek teknîkî wêdetir diçe.

Di vê çarçoveyê de, projeya boriyên petrolê yên Rojhilata Deryaya Spî ya pêşniyarkirî ji bo veguhestina gazê ji zeviyên Îsraîl û Qibrisê ji bo Yûnanistanê û dûv re jî bo parzemîna Ewropayê, ji bilî projeya kabloya elektrîkê ya binavî ku torên elektrîkê yên di navbera her sê welatan de bi hev ve girêdide, di hewldaneke ji bo zêdekirina ewlehiya enerjiya herêmî û cûrbecûrkirina çavkaniyên dabînkirina Ewropayê de, balkêş e.

Di heman demê de, Yûnanistan û Qibris hevkariya xwe ya bi Misirê re di warê hinardekirina gaza xwezayî ya şilekirî de kûrtir dikin, bi sûdwergirtina ji binesaziya heyî ya Misirê, ku hewcedariya bi rêyên transîtê di nav Tirkiyê re kêm dike.

### Hevpeymaniya berjewendiyan

Nêzîkbûna Îsraîl, Yûnanistan û Qibrisê nêzîkî 15 salan e ku piştî têkçûna têkiliyên di navbera Îsraîl û Tirkiyê de pêş dikeve, dema ku Til Ebîb hem di Yûnanistan û hem jî di Qibrisê de hevkarên alternatîf dît ku dikarin valahiyek siyasî û ewlehiyê ya berfireh tijî bikin. Wê dest bi çêkirina hevkariyê bi zimanek nerm li ser bingeha projeyên enerjiyê û dîplomasiya herêmî kir, berî ku paşê aliyên xurttir bi dest bixe.

Her ku di deh salên dawî de keşfên gazê li Rojhilatê Deryaya Spî zêde bûn, sedemên vê hevpeymaniyê zêde bûn, ji ber ku Îsraîlê di hevalbendên Atîna û Nîkosyayê de dît ku fikarên xwe yên li ser polîtîkayên herêmî yên Tirkiyê parve dikirin, çi di derbarê nakokiyên deryayî de be an jî helwestên siyasî yên têkildarî pirsgirêka Filistînê be.

Ji sala 2016'an vir ve, serokên her sê welatan nêzîkî 10 civîn li dar xistine ji bo vê rêyê, dê rêgezek stratejîk a aram nîşan dide ku li ser bingeha berjewendiyên hevbeş û vîzyonek hevpar ji bo entegrasyona herêmî ye.

Di salên borî de, Îsraîlê hebûna xwe wekî dabînkerê sereke yê alavên leşkerî ji bo Yûnanistan û Qibrisê xurt kiriye, bi dabînkirina wan bi sîstemên mûşekên pêşkeftî, dron û teknolojiyên şerê elektronîkî.

Hêzên Îsraîlî her wiha li ax û qada hewayî ya Yûnanistan û Qibrisê perwerdehiya xwe zêde kirine, bi sûdwergirtina ji erdnîgarî û erdê cihêreng, di nav de perwerdeyên hewayî yên simulasyona mijûlbûna bi pergalên parastina hewayî yên pêşkeftî yên wekî pergala S-300-ê yên li girava Girîtê bicîhkirî, pêk tînin.

Tevî israra Netanyahu ku ev hevkarî ne li dijî Tirkiyê ye, raporên medyayê yên ji Atînayê behsa lûtkeyê kirin ku avakirina hêzek hevbeş a bilez a nêzîkî 2,500 leşkeran nîqaş dike, ku wekî amûrek astengkirinê li rojhilatê Deryaya Spî hate pêşkêş kirin.

# Ji navdêrên jinên Kurd; Meryem Xan

Navenda Nûçeyan

Hunermend û dengbêja kurd Meryem Xan, xatûn û şaha dengbêjiya kurdî ye, xwediya dengê zîz û zelal e, stûna dengbêjiya resen e. Meryem Xanê, di sala 1904'an de li gundê Dêrgolê yê girêdayî bajarê Şernaxa Bakurê Kurdistanê ye ji dayîk bûye.

Bi fermana sultanê Tirkan re , sala 1915'an, malbata Meryem xan koçber dibe, destpêkê li Qamişlo, piştire li Şamê bi cih dibe.

Li Şamê, Meryem xan mîrek Bedirxanî nas dike, û evînek kûr di navbera wan de çêdibe. Hin jêder dibêjin ku ew zewicîne, û ji ber ku hevserê wê destûra karê huner û dengbêjiyê nedayê, wê dev ji wî berdaye, lê hin jêder jî dibêjin ku wan demekê ji hevûdu hezkirine paşî dev ji hev bedane bêyî ku şûkirin di navbera wan de bibe, ji ber veqetîna ji yarê xwe û êşa evînê, Meryam Xan ji wir koç dike û berê xwe dide Îraqê, demekê li Mûsilê dimîne, piştre diçe Bexdayê, û li mala keça apê xwe Elmas Xan Mihemd bi cî dibe, piştre Meryem xan ji mala keça apê xwe jî cihê dibe û malekê ji xwe re kirê dike.

Meryem xan li Bexdayê di weşaneke radyoyê ya li Bexdayê di beşa Kurdî de dest bi kar û xebata xwe ya hunerî dike. Wê demê destpêka weşana wê radyo ya Bexdayê bûye ji ber zîrekî û jêhatî bûna Meryem xanê rêvebiriya beşa Kurdî didine wê.

Di wê dema ku civaka Kurdî hunermendî û dengbêjiya jinê weke şerm û qephetek mezin didît, Meryem Xanê bi tenha xwe têkoşîneke bê hempa li hemberî vê hişmendiya teng û paşverû dikir, bi vîna xwe ya pûlatî û hezkirina xwe ji hunerê re gelek astengî derbas kir û dikarîbû navê xwe di cîhana hunera Kurdî de kûr bikole, û bighêje asta hunermendên serdema xwe yên navdar û bejinbilind wek nemir Mihemed Arifê Cizrawî.

Meyrem Xan yek ji jinên kurd yên pêşeng bû ku riya hunerê û dengbêjiyê girtin, tevî ku ev rê ji jinê re qedexe bû, û pir pirsgirêk, arîşe, qerwelk û serêşî ji dû wê digihanê, lê hunermenda me ranewestiya û gavên xwe bi bawerî di vê riya qeşeng de tavêtin.

Meyrem Xanê yekemîn jina kurd e, a ku bi wêrekî stranên xwe tomar kir û bi riya kasêtan stiranên wê hatin belavkirin, bi vê yekê tê hejmartin yek ji nav hunermendên kurd yên ku stranên foloklorê kurdî parastin û bi dengê xwe ji bo nifşên li dû xwe veguhestin .

Herwiha Meryem xan vedana dengê netewa xwe bû , ji ber ku di ezmanê dengbêjiya kurdî de dengbêjên wê demê serkêşê strana netewî ya kurd bûn, ku Meryem xanê jî yek ji wan e , û ew di vî warî de aleke berz û bilinde

Di stranên Meryem xanê de, evîn û hezkirina welêt diyar û xwiyanî ye.

Di wan stranan de gellek serpêhatiyên kurdan derbas dibin ; mîna strana "karwanê mala bavê sêvê, Mehemd Selîm zavakî taz e , wa axawo"

Meryem xan di koşk û dîwanxaneya malbatê de helbestvan , nivîskar û kilambêj dicivandin, deriyê mala wê ji hemû hunermendên kurd re herdem vekirî bû.

Hunermenda kurd Meryem Xan ji bo hunera kurdî gelek rexneyên tûj ji civaka girtî dîtin û pir zehmetî di jiyana xwe de kişand.

lê viyan û hezkirina wê ji hunerê re ji van astengiyan tevan xurtir bû ,lewre karîbû bibe stûnek ji stûnên hunera kurdî.

Dengbêja hêja Meryem Xan temenê xwe di nava xizanî û rebeniyê de buhirand, dawiyê ji ber nexweşiya gurçikan ve jiyana xwe ji dest da.



Hin jêder dibêjin ku ew di sala 1949 an de li Bexdê çû ser dilovaniya
xwedê .

Xatûn û şaha dengbêjiya kurd Meyrem xan ta di dema nexweşiya xwe de jî distra.

Bêhtir ji 200 stran û gelek sêlikên wê hene,

Meyrem xanê oxira xwe ji feleka xwe ya bêbext xwest , lê bi kilam û stranên xwe, kaniyeke zengîn û zelal ji guhdarvan û hunera kurdî re hişt.

• LAWIKÊN NASKIRÎ YÊN MERYEM XANÊ STRAYE :

1 – Wele Domam
2 – Bavê Koroxlî
3 – Mehmed Selîm zavekî taze
4 – Li xelkê tehlê, lê li min şêrînê (Helîm)
5 – Gewra min tu nîn e
6 – Sîwrê me sîwar bûne
7 – Mihemedo ronî
8 – Sêvê û Hecî Elî
9 – Lê Lê Yadê Rebenê
10 – Hesenê Pisman
11 – Elî Delal

• BESTEYÊN GELÊRÎ KU MERYEM XAN STRAYE:

1 – Qûmrîkê sêva tucara
2 – Girê Sîra bi sîr e
3 – Hey berde berde
4 – Lê lê Wesê
5 – Hey la li min xerîbê
6 – Gulşenî
7 – Lê dînê lê dînê
8 – Gulê hey nar
9 – Emo (Du qolî bi dengê Seîd Axa û Meyrem Xanê)
10 – Mêremê

# Pirsgirêkên me ne ferdî, civakî ne

Asya Waşûkanî

Gelo wê heya kengî tundî berdewam bike? Tundî her diçe xwe weke dêwekî mezin dibe û dibe ku hemû mirovahiyê jî daqurtîne. Dema mirov li ser mijara tundiyê dihizire gelekî li zora mirov diçe. Mirov tê rewşa dînbûnê. Manîfestoya Rêber Apo ji girtîgeha îmraliyê şand me xwend û em li ser lêhûrbûnê dikin. Me fêm kir ku hişmendiya qetlê û tundiya mêrperwer 30 hezar sal berî zayînê ye. Hîn jî ew hişmendî berdewam dike. Rojane bi dehan jin di nav malan de têne qetil kirin. Dîsa di sengerên şer de bi sedan ciwan têne qetilkirin û li holê rewşeke pir sosret heye.

Lê hîn jî ez wê berteka jin û civakê ya li hemberî tundî û qetlê nabînim. Ez pirs dikim, gelo ji bo jin û civak xwe nas bikin, li hemberî tundûtûjiya hişmendiya mêrê desthilatdar derkevin qadan çi pêwîst e. Ya rastî divê di serî de jin dengê xwe bilind bikin û bêjin, "Em zilm, tundî, kuştin, talan û destdirêjiya li ser jinê qebûl nakin." Hewce ye helwesta xwe ya li hemberî her cure qatilên kastîk deynin holê. Mixabin hîn jî ferdperestî heye û qatil têne parastin. Heya ew hişmendî hebe wê zilmên nû û qetilkirin jî hebe. Heya mirov wiha tevbigerin wê neyar jî fersendê li civakê bibîne û wê weke qatilên kastîk serê wan jêke.

Eger civak bi biryar in li pey bîrdozî û siyaseta Rêber Apo bimeşin, teqez wê serkeftî bin. Lê eger xwe virde û wirde bidin, wê koledarî û dagirkerî li ser me serwer be. Wê rewşa heyî xerabtir bibe. Pêwîst e bi zelalî biryar were dayîn û her kes hişê xwe bîne serê xwe. Pirsgirêkên me ne ferdî, civakî ne. Lewma divê em jî biryara xwe bi komî bidin.

Rêber Apo bi dehan salan e di nav şert û mercên herî zehmet de hewl dide ji bo me jiyana azad a bêtundî û bêzext ava bike. Bi fikir û felsefeya xwe rêya me ronahî bike. Rêbertî hewl dide pirsgirêka Kurd a li her çar parçeyan çareser bike. Hê jî bi kelecan û coşa ciwantiyê ji bo şoreşa azadiyê dixebite. Bang li her kesî dike ku destê xwe têxin bin kevir de û ji bo jiyaneke komînal, wekhev û azad têkoşîn bikin.

Me weke gelê Kurd gelekî derdê xiyanetê kişandiye. Eger em bêjin, "Xiyanet sedema sereke ye ya heya niha gelê Kurd bindest e", wê şaş nebe. Xiyaneta reş her weke xencerekê bû di 

pişta serhildanên gelê Kurd de. Lê Rêber Apo bi fikir û ramanên xwe yên dewlemend û têkoşîna xwe ya bîrdozî dawî li xiyanetê anî, roj bi roj gelê Kurd hemû kir yekpare. Rêbertiya me îro jî li ser wê têkoşînê banga pêvajoya aştî û civaka demokratîk dike. Ji derveyî serkeftinê ti şansekî me yê din tineye. Divê her kes xwe ji têkoşîna serkeftinê re amade bike. Hemû civak û nexasim jî jin divê haj ji vê rastiyê hebin, xwe bikin yek û çalak bibin. Pêwîst e ti kes barê xwe navêje ser kesekî din. Divê em hemû bi kar û xebatên pêvajoyê rabin. Li ser esasê ji bo serkeftinê yekîtî û hevgirtin pêwîst e, divê ji her demê bêhtir em bixebitin.



# 'Pêwîst e azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li gorî mafê hêviyê were misogerkirin'

**Endama Kongra Star Şehnaz Hesarî diyar kir ku heta Rêber Apo azad nebe wê tu aştî pêk neyê, herwiha wê çareserî ji pirsgirêka Rojhilata Navîn re neyê dîtin û got, "Pêwîst e di destpêkê de azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li gorî mafê hêviyê were misogerkirin."**

Viyan Egîd/Qamişlo

Di 27`ê Sibatê de Rêber Apo bangeke dîrokî ji bo Aştî û Civaka Demokratîk kir, got ez amademe ji bo çareseriya pirsgrika kurd û Rojhilata Navîn, lê ruxmî wê jî heta niha dewleta Tirk tu gavên cîdî û erênî neavêtiye, ji bo ku ew pêk were pêwîst e mafê hêviyê pêk were. heta niha hem êrişên li ser kurdan û tecrîda li ser Rêber Apo berdewam dike. Di derbarê vê mijarê de Endama Kongra Star ji Rojnameya me re axivîn.

**'Ji bo azadiya Rêber Apo em ê her dem li qadan bin'**

Şehnaz Hesarî di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser tecrîda li ser Rêber Apo û mafê hêviyê û wiha got: "Dewleta Tirk a dagirker naxwaza diyalog û banga aştiyê bigihêje serî ji ber vê jî her dem astengiyan derdixe. Rêber Apo heya roja îro di nava terîdeke bêmirovî re derbas dibe, di heman demê de heya roja îro mafê hêviyê ji bo Rêber Apo nehatiya daiyn. Di Cotmeha borî de, azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û mafê hêviyê wekî rojeva bingehîn hatibû pêşkêşkirin. Lê em îro dibînin ku yek ji van sozan jî nehatiye bicihanîn. Desthilatdariya AKP'ê di çarçoveya ranta siyasî de nêzî pêvajoya aştiyê dibe. Li şûna ku Tirkiyê ji bo aştî û azadiya gelan pêşî aştiya xwe ya navxweyî pêk bîne, bi hincetkirina statuya Rojava, hewl dide pêşiya aştiyê bigire. Em vê yekê qebûl nakin. Tu mafê dewleta Tirk ku aştiya xwe ya navxweyî pêk naye, tune ye ku destwerdanê li cih û gelekî din bike. Her wiha pêwîst e azadiya Rêber Apo ya fîzîkî pêk were, ji berk u yê ku pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk pêk bîne Rêber Apo ye. Rêber Apo kilîta çareseriya tevahî alozî û pirsgirêkên Rojhilata Navîne.

Bêguman em jî di wê baweriyê de ne ku Rêber Apo wê vê pêvajo bi ser bixe û her pêkaheteyek bigihêje mafê xwe. Em niha bi hêviyên pir mezin dijîn, ji ber ku Rêber Apo di banga xwe de her carê hêz û hêviyê dide gelê xwe. Ji bo azadiya Rêber Apo em ê her dem li qadan bin."

**'Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, em ê asta tekoşînê bilind bikin'**

Şehnaz di berdewamiya axaftina



xwe de diyar kir ku heta ku Rêber Apo azad nebe wê tu aştî pêk neyê û çareseriya pirsgirêka Rojhilata Navîn de pêk nay û wiha pê de çû: "Bû 26 sal ku tecrîd li ser Rêber Apo didome, gelê Kurd ev 26 salin Rêber Apo di dilê xwe de hembêz dike. Ji 27 Sibatê heta roja îro hewildanên Rêber Apo ji bo aştiyê hene, heta gihaşta asta ku PKK'ê xwe bide fesexkirin, PKK`ê di 12'emîn Kongreya xwe di navbera 5-7'ê Gulanê de pêk anî û ragihand ku têkoşîna xwe derbasî qada aştî û siyaseta demokratîk kiriye. Em hêvî dikin ku Dewleta Tirk gavin berbiçav bavêjin ji bo aştî pêk bê. Em azadiya fêzîkî ya Rêber Apo dixwazin û ji bo azadiya fîzîkî a Rêber Apo em ê têkoşîn bikin. Heta ku Rêber Apo azad nebe wê tu aştî pêk neyê û çareseriya pirsgirêka Rojhilata Navîn de pêk nay, em wekî gelê kurd em ê hertim têbikoşin û tev bigerin heta ku Rêber Apo ji îmralî were derxistin ku aşitî û demokratî pêk were."

**'Pêwîst e azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li gorî mafê hêviyê were misogerkirin'**

Şehnaz da zanîn ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û mafê hêviyê ji bo pêvajoya niha çareseriya: "Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hêviyê dide pêvajoyê. ji bo vê jî heger dewleta Tirk Rêber Apo serbest bike wê demê em dikarin bvêjin ku dewleta Tirk di çareseriyê de cidî ye. Lê heya niha ev yek nade diyar kirin, dewleta Tirk ne di cidîyeta vê pêvajoyê de ye, qaşo dibêje Tirkiyê dewleteke demokratîke, me heya niha ew demokratîk bûyin nedîtiye û heta nedaye nîşandan ku ew dixwaze pêvajoya Aşîtî û Civaka Demokratîk bi cih were. Her car wê bi hincetekê derkeve pêş da ku azadiya Rêber Apo û mafê hêviyê paşguh bike. Lê em jî ji dewleta Tirk re dibêjin, eger ew azadiya Rêberê me paşguh bike, em hemî li ser piyane û em ê heya dawî daxwaza azadiya Rêber Apo bikin. em tu carî Rêber Apo ji bîr nakin, îro em bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo hatin ser hişê xwe û me karî wekî her kesî daxwaza maf û Kurdistana xwe bikin bê tirs û terdud. Li gorî vê yekê jî pêwîst e di destpêkê de azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li gorî mafê hêviyê were misogerkirin. Her wiha divê mafê gelê Kurd ji aliyê destûrî ve bike hebûneke rewa ya qûnûnî."

**'Kilîta çareseriyê li Îmraliyê ye'**

Şehnaz Hesarî di dawiya axaftina xwe de da xuyakirin ku baweriya me bi Rêber Apo ye û wiha domand: "Me her dem digot kilîta çareseriyê li Îmraliyê ye, em vê gotina xwe careke dikin. Ji bo vê jî pêwîst e deriyê Îmralî were vekirin. Rast e pêvajo bi fikir û perspektîfên Rêber Apo bipêş dikeve, lê divê ew bi awayê fîzîkî di nava vê yekê de amde be. Bi taybetî divê xalê de mafê hêviyê bikeve dewrê, piştî 26 salan ji girtin û tecrîda ku hat jiyankirin û piştî Rêber Apo helwesta xwe aştiyê nîşan da, pêwîst bû ku mafê hêviyê biketa piratîkê. Ji ber ku baweriya me bi van hêzên hegemon tune ye, baweriya me bi Rêber Apo ye."

# Yek ji sûcên dijmirovî li Sûriyê; Firotina Jinên Elewî

Navenda Nûçeyan

**Piştî bûyerên Berava Sûriyê û komkujiyên ku li dijî Elewiyan pêkhatin, bi dehan jinên Elewî ji aliyê çekdarên girêdayî hikumeta veguhêz ve hatin revandin. Li gorî hin raporan nêzî 250 jinên Elewî yên li Girtîgeha Harim'ê girtîbûn, bi tora ku li bernameya Sîgnalê hatiye organîzekirin, hatine firotin.**

Girtîgeha Harim'ê girtîgehek e ku li navçeya Harim a Îdlib'ê ye, herwiha di dema şerê navxweyî yê Sûriyê de gelek caran dest guhertiye. Ev girtîgeha ku nêzî 8 sal berê hatibû avakirin, piştî ket bin kontrola HTŞ'ê bû cihê ku bi hezaran girtî lê kom bûn. Dema HTŞ'ê herêm girt, deriyên gelek girtîgehan vekir û girtiyan serbest berda, lê Girtîgeha Harimê ji vê biryarê bê par ma. Tevî ku kapasîteya vê girtîgehê têra 5000 kesî nake jî, lê tê zanîn ku ev hejmara girtiyan hê jî di hundir de tên girtin. Di heman demê de hat zanîn ku ev bazirganiya jinan li herêmên Tirkiye, Idlib û Hemayê di bin koordînasyona HTŞ û MÎT'ê de hatiye kirin.

Firotina jinan
zêdetirî 250 jinên Elewî yên li Girtîgeha Harimê girtî ne, bi tora ku li bernameya Signalê hatiye organîzekirin, hatine firotin. Li gorî agahiyên ku me ji navenda Lêkolînên Istratîjî ya Kurdistanê bi dest xisti ne, Ebû El-Hewra El Yemanî vê torê bi rê ve dibe û bi kodekî taybet firotinê digihîne kesekî bi navê Enes Ebû El Hebra. Hat diyarkirin ku Hebra berê beşek ji opozîsyona Sûriyê bû û çavdêrê vê bazirganiyê bû. Ev bazirganiya jinan li Tirkiyê, li herêmên Tirkiye, Idlibê û li Hema'yê bi çav girtina hikûmeta Colanî bi awayek torî tê meşandin.

**Sivîlên elewî yên hatî revandin û qetilkirin**

Li gorî daneyên fermî ya Neteweyên Yekbûyî, di Adara 2025'an de herî kêm 38 jin û keçên ciwan ên elewî li Laziqiyê, Tertûs, Hema, Şam, Heleb û Humsê ji aliyê çeteyan ve hatine revandin, tê zanîn ku hinek ji wan birin navendên îşkenceyê û hinek jî hatin îdamkirin.

**Ji sedî 20'ê kesên hatine revandî jî bi îşkenceyê hatin îdamkirin**

Li gorî tê zanîn ev hêjmar ji bo mêran 100'î derbas dike. Ber bi miha Cotmehê ve hêjmara jinên hatine revandin ji sedî derbas dike. Ji sedî 20'ê kesên hatin revandî jî bi îşkenceyê hatin îdamkirin û bi vî awayî hatin dîtin. Li gorî daneyên fermî, di meha Adarê de li gundên derdora Laziqiye û Tartûsê li zêdetirî 40 cihan nêzî 500 sivîlên Elewî hatin kuştin, lê li gorî çavkaniyên herêmî hejmara kuştiyên Elewiyan ji 3 hezarî derbas kiriye.

Her wiha Li gorî daneyên Wezareta Parastinê ya hikûmeta demkî ya Sûriyê, zêdetirî 12 komên cuda beşdarî van komkujiyan bûne û nîvê van koman di lîsteyên tawan ên navdewletî de ne.



**Navendên îşkenceyê**

Komkujî, revandin û înfaz bi taybetî li Laziqiyê, Tartûs, Humus û Hemayê bi koordînasyona MÎT û HTŞ'ê berdewam dikin. Weke ku Lekolîn.org di nûçeya xwe ya taybet a berê de diyar kiribû, bi dehan Elewî hatin revandin û wan birin navendên îşkenceyê yên li du herêmên sereke. Kampa Ibn el-Heytsam li Humusê û avahiya kevin a Partiya Baas li Bab El Sebaa, wekî navendên îşkenceyê têne zanîn.

Li gorî rapora "Komîsyona Lêkolîna Bûyerên Peravê" ya ku HTŞ'ê di Tîrmeha 2025'an de pêşkêş kiribû, di van qetlîaman de 406 sivîl hatin qetilkirin. Tevî ku di raporê de hatiye diyarkirin ku nêzî 300 kesên ku sûcdar hatine dîtin tu têkiliya wan bi HTŞ'ê re nîne, berevajî vê raporê, bi dehan belge û dîmen nîşan didin ku HTŞ rasterast beşdarî van qetlîaman buye ku di nav Wezareta Parastinê de, eşkere dike ku di bin serokatiya Hasan Abdul Ganî û bi çeteyên girêdayî MIT'ê re tevdigere.

# ‘Çareserî bi veguherîna qanûnan a berfireh pêkan e’

**Hevberdevkê Komîsyona Têkiliyên Derve ya Partiya DEM’ê û Parlamenterê Amedê Berdan Ozturk da zanîn ku rastiya vê pêvajoyê Aştî û Civaka Demokratîk e, aştî hebûna şer nîşan dide, demokrasî pêdiviya civakê nîşan dide û got, “Hakan Fîdan dixwaze hebûna xwe ya siyasî li ser dijminatiya gelê Kurd biparêze."**

**Esma Mistefa**

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a ku bi avakirina Komîsyonê re li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê hatiye avakirin, pitî derbasbûna zêdetirî şeş heyvan ji hin aliyan ve hewildanên dirêjkirin û xetimandinê tê kirin. Girêdayî vê yekê û idiyayên ku tên kirin Hevberdevkê Komîsyona Têkiliyên Derve ya Partiya DEM’ê û Parlamenterê Amedê Berdan Ozturk bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.



**- Hûn pêşveçûna pêvajoya aştî û civaka demokratîk çawa dinirxînin?**

Helbet pêşveçûna pêvajoyê li gor hêviya civakê bi rê ve naçe, gelek hûrguliyên weke qanûnî, siyasî û civakî yê vê pêvajoyê hene, ji ber vê yekê heta ev pêvajo bi serkeftinê dawî nebe wê kêmasî tim hebin. Xeynî birêz Ocalan aktorên din yên weke Bahçeli û desthilatdariya AKP’ê der barê pêvajoyê de gelek tiştan dibêjin lê gotina xwe bicîh naynin. Birêz Ocalan aktorê herî girîng ê vê pêvajoyê ye ku gotina xwe bi cih aniye. Li ser banga wî PKK’yê xwe fes kir, çekên xwe îmha kir, gelê Kurd xwedî li pêvajoyê derket lê aliyên din ên pêvajoyê heta niha gaveke şênber neavêtine. Binêrin şert û mercên birêz Ocalan û aliyên din ên pêvajoyê ne yekin. AKP û MHP kengê bixwazin daxwuyaniyê bidin didin, kengê bixwazin hevditînê pêk bînin tînin, lê birêz Ocalan xwediyê van şert û mercan nîne. Ev yek jî rê li ber nîqaşan vedike û bandoreke neyînî li pêşveçûna pêvajoyê dike. Ligel vê yekê em bawer in ku yên ji bo ev pêvajo dest pê bike li deriye Îmraliyê xistine wê berpirsiyariyên xwe jî bicih bînin

**- Ji bo pêşvebirina pêvajoyê, Rêber Apo û Tevgera Azadiyê gavên girîng avêtin û bi erkên xwe yên serdemê rabûn, pêwîstbû di heman demê de ji aliyên dewletê jî di milê qanûnî de gav hatibana avêtin. Sedema derngmayîna gavavêtinên qanûnî ji milê dewletê ve çi ye?**

Weke ku tê zanîn pêvajoya aşitiyê ya ku di navbera salên 2013-2015’an de pêk hat bi destê AKP’ê xera bû, îro jî bi destê dewletê ji nû ve ava dibe. Her çiqas desthilatdar AKP be jî berpirsiyar dewlet e. Ji ber vê yekê desthilatdarî dixwaze ku ev pêvajo li gor daxwazên wê bi rê ve biçe. Desthilatdarî jî dixwaze li gor berjewendiyên xwe yên siyasî gav bavêje û hesabê hilbijartinê, hesabê parastina desthilatdariya xwe dike, hesabê berjewendiyên civakê nake lê daxwaza civakê demokrasî, wekhevî, edalet û azadî ye. Ev jî bi avakirina civaka demokratîk pêkan e. Heger daxwazên aliyekî rêya pêvajoyê diyar bikira pêdivî bi muzakereyê jî tinebû. Heta muzakere berdewam bike daxwazên civakê û hemû aliyan li ser masê ne. Pêvajo didome.

**- Rayedarên Tirk bi zimanê dijber û têgînên wekî Tirkiye bê teror nêzî pêvajoyê dibin, Hakan Fîdan jî careke din gef li Rojavayê Kurdistanê xwarin û rûyê xwe yê rast eşkere kir. Armanca dewletê ji bikaranîna zimanê dijber çi ye û çima destkeftiyên Rojava ji xwe re xeter dibînin?**

Ev sed sal in ji bo ku qetliamên li dijî gelê Kurd meşrû nişan bidin peyva Kurd bikarneanîn, doh peyva eşqiya bikar dianîn, îro jî peyva terorê bikar tînin. Armanca wan ew e ku sebebên polîtîk û dîrokî yên meseleya Kurd neyê rojevê. Berê digotin pirsgirêka Kurd tine ye, hebe jî ji xwe me çareser kiriye. Dixwazin ku meseleyê wek meseleya ewlehiyê nişan bidin, aliyê siyasî yê meseleyê veşêrin. Dixwazin ku têkiliya tevgera Kurd û meseleya Kurd ji hev qut bikin, lê kes bi vê yekê naxape herkes jî dizane ku hebûna tevgera Kurd encama meseleya Kurd e. Rastiya vê pêvajoyê Aştî û Civaka Demokratîk e. Aştî hebûna şer nişan dide, demokrasi pêdiviya civakê nişan dide.

Hişmendiya dewletê ya ku hewl dide ku meseleya Kurd neyine ziman, li ber serê xwe jî Kurdên xwedî statû naxwaze. ji xwe aşkere gotin ku em ê nehêlin ku xelatiya li Başûrê Kurdistanê dubare bibe. Ji ber vê yekê cîrantiya DAİŞ’ê xwestin lê ya Kurdan nexwestin. Destkeftiyên gelê Kurd ên li Rojava helwesta Hakan Fîdan diyar dike, hêviya statuya li Rojava tirsa Hakan Fîdan zêde dike. Ji ber vê yekê ye ku weke wezîrê karê derve yê Sûriyê tevdigere. Ji ber vê yekê ye hewl didin ku peymana 10’ê Adarê li gor daxwazên xwe dîzayn bikin. Hakan Fîdan dixwaze hebûna xwe siyasî li ser dijiminatiya gelê Kurd biparêze.



**- Ji bo pêşvebirina pêvajoyê pêwîst e ji aliyê dewletê ve çi bê kirin?**

Berî her tiştî divê dewlet daxwaza civakê ya aştî û demokrasiyê paş guh neke û di vî warî de gavên şênber bavêje. Weke ku me berê jî anî ziman ji bo pêşveçûyina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk divê ku mafê hêviyê pêk were û birêz Ocalan azad bibe. Meseleya Kurd meseleyeke ewlehiyê nîne, meseleya hiqûq û demokrasiyê ye û çareserî jî bi veguherîna qanûnan a berfireh pêkan e. Ji bo vê yekê divê li ser bingeha wekheviyê entegrasyona civakî were avakirin. Çand û zimanê Kurdî bi salan bi qedexe û astengiyan re rû bi rû ma û gelek caran bû sedema êrişên nijadperestî ji ber vê yekê divê zimanê Kurdî bibe xwediyê statuyeke fermî. Ev yek ji bo wekhevî û avakarina aştiya civakî pêwist e. Her wiha gelek caran bi destên qeyûman îradeya gelê Kurd hate desteserkirin, divê ev polîtikayên qeyûmê bi dawî bibin û xweseriya rêveberiyên heremî xurttir bibe.

FENER



## Bi `Defciyên` Qesrê Re Welat Nayê Birêvebirin!


**Idrîs Henan**

Bi qasî ku destpêka 2025`an ji bo gelên Sûriyê salek taybet bû, dawiya wê jî gelek sosret û qerebalix bû. Dema ku mirov çavekî bi lez li kapasîteya daxuyanî, nerîn, şîrove û analîzên salekê derketine de bigerîne, dê baş têbigihêja ka me salek çawa derbas kiriye! Çendîn hewl hatiye dayîn ku weke salek cudayî yên hikumê Esad xuya bike û qaşo ku serdestî û destpotî xilas bûye, lê niyet û hişmendiya bi tundrewiyê re strandî nekariya were nixumandin. Ji xwe du xetên paralel bûn. Cudahiya wan tenê ew bû; kî kariye destpotiyan ji yê din pirtir bike?! Kî kariye di demek kurt de pêkhateyan kedî bike?! Kî ji kê leztir civak keriyê pez û naxirên koletiyê ava kiriye?!
Mixabin; pêşbirka HTŞ bi hişmendiya Baas`ê re bû. Di dirêjahiya salê de, daholvanên desthilatdariya nû li Sûriyê, “Defciyên” HTŞ, hemû hêza xwe ya şênber û razber xistine dewrê û xwestina bi rêbazên çek, zext û xîtabên neferet, sorkirin û dijatiyê pirsgirêkên civakî li Sûriyê çareser bikin! Dîsa jî tu encam bi dest nexistin. Xwedî aqilekî wisa xirab in ku tişta berê hatiye ceribandin ji nû ve diceribînin.
Aliyekî ve jî mirov nikare loman jê bike, ji ber ku di rastiya li ser erdê de, Baas têk neçûye. Tişta li Sûriyê qewimiye; darbeya hundirîn a Baas`ê bi xwe ye. Ji ber vê yekê her tişt wek xwe maye lê tenê amûr û rûyên mirovan hatine guhertin. Stratejiya herdu tabloyan jî li ser bingeha înkar û yekdestariyê ye. Lew re jî pir cudahî nîne û HTŞ weke berdewama Baas tê hesibandin. Çima em vê gotinê dibêjin?
Ji ber ku encama derketiye holê ti rêyek cudayî ya Baas`ê nîşan nedaye û ne jî hêviyên gelên Sûriyê yên azadî û demokrasiyê bi cih hatine. Berovajî wê yekê; êriş, zordarî, înkar, dezinformasyon û polîtîkayên yekperestiyên bilindtir bûne.
Bi peymana 10 Adarê re xeta dixwaze welat li gorî nirxên demokrasiyê ava bike jî diyar bû. Awayê ku HTŞ xwestiye bi lez û bez xwe dewlet ragihîne, awayê destpotan e. Yanê; “Divê hemû xêr û bereketa vî welatî di bin destê min de be. Ti hêz ji bilî min nîne û nabe ku kesek din beramberî min hebe! Ez tekane îlahê we me û divê hûn ji min re secde bikin!” Bi rastî destpotiyek ecêb ê ecemî ye. Rejîma Baas nîv qirnek hikum kir û nekarîbû îradeya gelên Sûriyê dîl bigire, çend roj derbas nebûne û tu hatiye wê yekê di nava salekê de bikî? Ev ne karê kesên dixwazin dewletê ava bikin. Ev karê rêbir û firsendciyan e. Dewletbûyîna berê venagere.
Ev heqîqeta têkoşîna gelên Sûriyê yê demokrasî û azadiyê ye. Tam ji bona vê jî peymana 10 Adarê li HTŞ hatiye sepandin ku bi hemû hîle û rêbazan hewl dide jê birêve û bi cih nîne. Navbeynkariya navneteweyî jî hebsarê HTŞ kurt kiriye û mekanîzmayên gengaz ên revandinê asteng kirine. Yanê bicihanîna peymana 10 Adarê wê ne li gorî şîroveyên “Defciyên” HTŞ yên salekê be û wê ne li gorî waz û rewşa hêzên herêmî be jî. Yanê divê Sûriyê li gorî hevsengiyên hundirîn aşîtiya xwe ava bike û fêm bike ku serweriya welat ne bi navendîbûn, bi pirrengiyê re tê parastin.
Eger “Defciyên” qesra desthilatdaran sûdek li kesekî bikirana, wê rejîma Esad hilneweşiya. Yan wê Sûriyê bibe malê her kesî, yan jî wê cihê HTŞ tê de nîn be.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**



Helbestvan Rûşen Yûsif
“Dengê jina kurd ya ku ji êşê hêviyê, û ji bêdengiyê awazan çêdike.”
Helbestvanên jin ên kurd di dewlemendkirina wêjeya kurdî ya nûjen de rolek girîng lîstin, gotin tenê ne ji bo nivîsê dinivîsandin, lê pênûs kirine çiraxek ku rêyên nasname û çandê ronî dike.
Helbestên wan ne tenê nivîsar in, lê henaseyên hestên mirovî yên pak in, ji evîna kûr û êşên veşartî , heta hêvî û hewesek nû ya azadî, dadwerî û wekheviyê.
Bi rêya van nivîsan
jina Kurd bûye vebêjerê serpêhatiya xwe û hilgirê mîrasa gelê xwe, ji tîpan piran di navbera paşerojê û îroyîn de, di navbera bîranîn û erdnîgariyê de, di navbera xwe û civakê de diafirîne.
Di vê çarçoveyê de helbestvana Kurd Rûşen Yûsif weke yek ji dengên jinan ên herî diyar ên di qada wêjeya Kurdî ya hemdem de derdikeve pêş, ku pênûsa xwe terxan kiriye ji bo xizmeta doza xwe û gelê xwe, helbestên wê ruhê xaka kurdistanê dihilmjîne û çîrokên dara zeytûnê, çiya û sirgûnê vedibêje, serpêhatiya jinên kurd dixemilîne û bi ronahiya xwemaliya kûr û hişmendiya çandî ronî dike.
Di hembêza çiyayê Kurmêncê de, ku keskiya çiyayan mîna şapikekî bêdawî ku ji xewn û xakê hatiye pêçan, dirêj dibe, û poz û qopên çiyayên Hawar û Lêlûnê ewran hemêz dikin , û ji zevîyên bênxweşiya zeytûnan û bêhna nêrgizan jê dibare û mîna awazên sira bayê Efrînê li asoyê belav dibe, û sîbera gundên bêdeng hembêz dike.
Li wir , li bin sîberên Efrîna keskîn de , bûka Rojava, ku bi bîranîna Hûrî û Mîtaniyan zindawer, li ser vê xaka pîroz helbestvan Rûşen Yûsif di sala 1972’an de ji dayîk û bavek Kurd (Hisên Ewnî Yûsif û Semîra Yûsif) li gundê Mosako yê girêdayî navçeya Raco ya Efrînê hatiye dinyayê, di nava malbateke Kurdperwer , neteweyî û kedkar de, ku ji sê bira û sê xwişkan pêk tê, ku li ser nirxên kurdewariya resen, hezkirina ji axê,
wefadariya bi wê re û
dilsoziya bi welat re mezin bûne.
Wê zarokatiya xwe li wî gundê çiyayî yê xweş û bêdeng derbas kir, di nav rezên zeytûn, hêjîr û hêranan de û vekirî li ber bayê azadiyê yê ku tê ji çiyayên Kurdaxê, ew mezin bû di maleke nefsbiçûk de, dewlemend bi jiyana gundewarî û ruhê civakbûnê , gundê ku bêhna nanê tenûrê sibehan jê dibare û êvaran jî bi dengê serûliyên kurdî şevq dide , wê guh dida çîvçîva çivîkan yên ku bi stranên dayikan re li zeviyan tevlihev dibûn, û temaşe dikir li dapîran dema ku çîrokên destanên kevnar ên li ser şêrgel û lehengên ku navên wan hatine xêzkirin li ser kevirên demê vedigotin.
Di wan kêliyên despêkê ên hişyarbûna wê de, tiştekî mîna helbestê di giyanê wê de şîn bû, û wê dest bi hûnandina nehêniyên cîhanên xwe yên ji hesret û xeyalê kir , ku dengên xwezayê bi rajena mirovan re tevdigeriyan, çiya di bûn perestgehên azadiyê, û kanî dibûn bilûrên jiyanê.
Li wir , di navbera xuşîna belgêt darên zeytûnan û ringeringa tevr û bêran de, taybetiyên wê yên yekemîn avabûn û têgihîştina wê bi awazên folklora kurdî ku zevî û xaniyan bi kêf û hem jî bi xemgînî tije dikin, geş bû.
Hewesa wê ya wêjeyî û çandî di temenek biçûk de, dema ku di dibistana navîn de dixwend, di bin bandora jîngeha hunerî û çandî ya derdora wê de dest pê kir, û ji dilê wê jîngeha gundewarî ya tijî bêhn û xwêdan, yekem hişmendiya wê ya edebî û çandî derket holê , ji zarokatiya xwe ve, di demsala dirûnê de li stranên jinan, li çîrokên dapîran ên li ser şehsiwar û lehengan û li nalîna bilûrê di dema roj di çû ava guhdarî dikir.
Li wir, di navbera zeytûn û xunavê de, di navbera ronahiya heyvê û stranên palevanan de, helbest di hundurê wê de afirî , mîna kulîlkek ku ji zikê zinaran şîn dibe, û ji çîrokên kevn ên ku dayikan di şevên sar ên zivistanê de di bin ronahiya çirayan de digotin, tovên pêşîn ên helbestê di wijdanê wê de şînbûn.
Ji wê jîngeha dewlemend bi sembol û hestan, hişmendiya wê ya mirovî û netewî hate afirandin û hezkirina kurdî û nirxên dilsoziya bi ax, welat û zimanê wê re di ruhê wê de hate çandin, wê gotinên xwe ji xuşîna çemê Efrînê û xumxuma sulavên Cemrûkê vehûnandin û ji nîşaneyên Kela Nebî Horî û Kela Sim’an, ruhê xwedîbûn û dilsoziya bi ax û dîrokê re îlham girt.
Helbestvan Rûşen xwendina xwe ya seretayî û amedeyî li bajarokê Meskene ya herêma Minbicê , girêdayî parêzgeha Helebê, dûrî gundê xwe yê bedew, gundê ku zarokatiya wê ya yekem himbêz kirî di nav keskayê zeytûnan û bênxweşiya çiyayên kurdan de , paşê xwendina xwe ya navîn li bajarê Helebê berdewam kir, li wir taybetmendiyên hişmendiya wê yên rewşenbîrî û helbestvaniyê dest pê kir, hişê wê vebû li ser cîhana peyv û helbestê .
Bi destpêkirina şerê li Sûriyê di sala 2011’an de, wê xwe li ber qonaxeke nû di jiyana xwe de dît, lewra wê riya ronahiyê di nava tariyê de hilbijart, û nivîsandin di dema wêraniyê de kir.
Di navbera salên 2013 û 2016’an de tevlî Peymangega Zimanê Kurdî li bajarê Efrînê bû, li wir zimanê xwe yê zikmakî xwend û li ser nehêniyên wê yên bedewîyê û hestyarî yê kûr bû, bawernameya zimanê Kurdî wergirt , ew ne tenê belgeyek zanistî bû,lê ew pasporeka derbasbûnê bû ji bo cewherê xwe û dergehek ji bo cîhanên afirîneriya rastî bû.
Rûşen di salên xwe yên destpêkê de dest bi nivîsandina helbestê bi zimanê erebî kiribû, lê hesta wê ya kûr a girêdana zimanî û çandî, bû sedem ku paşê vegere li zimanê xwe yê dayikê, lewra xwendina wê ya bi zimanê kurdî, bû destpêka rasteqîn a xebata wê ya helbestî.
Ji wê demê ve helbestên wê bi zimanê zeytûn û çiyan dijene, derbirîna xwe, nasname, hesret, jin û welatê xwe dike di hevsengiyek di nava xem û zehmetiyê de .
Rûşen di bin bandora helbestvanê mezin ê kurd Cegerxwîn de maye, nemaze bi helbestên wî yên stranbêjiyê ku di nav malan de û di helkeftên gelêrî de dihatin gotin, hişmendiya wê ya edebî û neteweyî ronî dikirin û wan alîkarî dane wê ku bi zimanê dayikê xwe binivîse, ku peyv li ba wê bibe kiryareke berxwedanê û bedewîyê di heman demê.
Rûşen helbesta nûjen û azad dinivîse, xwe dispêre hesta xwe ya mirovî ya kûr û bi îlhama nebeza rastiyê û dengê axê, ew di peyvê de pirekî di navbera çandan de dibîne, û dengeke ku derbirîna ruhê jina Kurd a berxwedêr û xewna wê ya sermedî ya azadî û rûmetê dike, ji ber vê yekê riste dike welatekî din, û helbestê dike malek ku bîranînê û wijdanê himbêz dike.
Piştî bi salan ji dayînê li herêma Efrînê, çenteyê xwe yê tije ji bîranîn û helbestan hildigire û ji bajarê xwe û darên zeytûnan ên ku bi dilpakî û hesret jê hez dikir, derdikeve, wiha rûpelek ji jiyana xwe di nav çiyayên welat û stranên wê de di digire.
Di sala 2016’an de neçar ma ku welatê xwe biterikîne, berê xwe bide Elmanyayê, malbata xwe, bîranînên zarokatiyê û xeyalên xwe yên yekem li dû xwe hişt,û di çavên wê de tijî rondik û di dilê wê de hezar êş û keser li ser welatê ku qet ji wijdanê wê dernebûn hebûn.
Li pinaberiyê , dest bi qonaxeke nû ya jiyana xwe ya afirîner û mirovahî kir, ku tê de bêhna zeytûnan û germahiya xakê di helbestê de hildigirt û di her tîpeka xwe de agirê welat zindî dikir.
Li wir, di sirgûniya dûr de, guriya hezkirina zeytûnê ya di dilê wê de nevemirî , ronîtir û geştir bû , û helbest ji bo wê bû welatek paralel, ku tê de bêhna erdê, dengê çiya û germahiya dayikê diparêze.
Rûşen bi Kurdî û Erebî dinivîse û di helbesta xwe de nûnertiya dengê jina Kurd a pêdar, çîrokbêja dîrokê û hilgira xetîreya nasname û çandê dike, da ku gotinên wê li ser rûpelên demê weke nebezek zindî bimîne, ku bi ax û mirovan re bi peyîve û hezkirina welat û xweparêziyê di dilan de biçîne.
Di nav berhemên wê yên wêjeyî yên çapkirî de, yekemîn dîwana xwe bi zimanê Kurdî, bi navê “Hestên Zeytûnî”, di sala 2020’an de çap kir, berhemeke ku tevlîheviya wijdanê Kurdî û semboliya zeytûnê ya Efrînê ku di peyvên wê de dijene, hildigire.
Rûşen dîwana xwe ya helbestan bi zimanê Kurdî nivîsand, da ku ji cîhanê re bêje ku zimanê Kurdî ne tenê navgîna vegotinê ye, lê welatek e ku di helbestê de dijî û jina Kurd dema ku pênûsê digre dest, bi xwînê dîrokê dinivîse, bi hêstirên dayikan û bi stranên çiyayan xêz dike.
Çend destnivîsên wê yên edebî bi zimanê kurdî û erebî hene, di nav wan de dîwaneke helbestan a bi şêweya helbesta nûjen bi zimanê kurdî, ku li ber çapê ye.
Helbestvan Rûşen gelek bawernameyên pesindayînê ji saziyên çandî wergirtin, rêzgirtin ji bo xebatên xwe yên wêjeyî û çandî , ji wan:
1- Spasname ji Komîteya Çalakiyan a Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê di sala 2024’an de.
2- Spasname ji Akademiya Çandî ya Navneteweyî li Osnabrückê di sala 2024’an de.
3-Spasname ji Festîvala Helbesta Kurdî , ya ku di bin çavdêriya Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê di sala 2024’an de hate lidarxistin.
Gelek hevpeyvîn jî bi wê re di rojname, kovar û kanalên kurdî yên navdar de hatin kirin, mîna: (Çira TV, Kurdistan TV, Stêrk TV, û yên din), ku tê de behsa serpêhatiya helbestî û dîtina xwe ya li ser rola wêjeyê di parastina nasnameya kurdî de dikir.
Piştî ku di sala 2016’an de koçberî Almanyayê bû, beşdarî çend şevbuhêrk û festîvalên helbestî bû û heta îro jî li wir dijî, bêhna zeytûnan û bîranîna Efrînê ya ku qet ji bîra wê nare di dilê xwe de hildigire.
Helbestvan Rûşen ne tenê dengekî femînîst e di qada helbesta kurdî de, lê yek ji awazên ruhê kurdî ye ku naxwaze were vemirandin.
Di helbestên wê de xweza bi sembolîzmê re têkel hev dibe , Çiya, zeytûn û baran ne tenê wêneyên helbestî ne, lê sembolên pêdarî , hêvî û jiyanê ne.
Peyvên wê dibin mîna şitlên ku digihêjin esmanan li lêgerîneke azadîya berfirehtir digerin û rehên ku bi kûrahî xwe di axa dîroka Kurdî de berdidin.
Tîpên wê êşa sirgûnê û bêhna welat hilgirtibûn û helbest kiribûn welatekî berdêl ku giyanên li ronahiyê digerin lê bijîn.
Her helbesteke wê neynika jinekê ye ku bawer dike ku peyv dikare hêviyê di dilên bindest de biçîne û ziman wekî kaniyek qet zuha nabe zindî bimîne.
Bi vî awayî Rûşen dengek Kurdê azad dimîne ku şewqa welat û hêsirên sirgûniyê di destê xwe de hildigire, ew helbestê distrê wek ku elend soza xwe dide rojê û dinivîse da ku peyv bibe pirek di navbera bîr û sirgûnê, di navbera ax û xewnê de, di navbera jina kurd û azadiya ku namire de.
Di karê wê de serkeftin û afirîneriyek zêdetir dixwazim.

# ‘Aboriya Jin hêz û îradeya jinê ye’


**Rêvebera Aboriya Jin li bajarê Dêrikê Axîn Abdullah diyar kir ku dema ew behsa aboriya jin dikin tê wateya hêz, îrade û fikira ku çawa jin bi xweseriya xwe bikaribe karê çandiniyê di nav civakê de bimeşîne.**

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Aboriya Jin di sala 2015’an de li ser bingehê fikir û felsefeya Rêber Apo li bajarê Dêrikê hat avakirin û heya roja îro jinê karî vê yekê bigre ser milê xwe û karê çandiniyê careke din bike û birêve bibe, tevî hemû zor û zehmetiyên ku civakê jê re çêdikirin jî lê ew bû pêşenga civakê.
Di derbarê kar û xebatên Aboriya Jinê li bajarê Dêrikê Rêveberiya Aboriya Jin li bajarê Dêrikê Axîn Abdullah ji Rojnameya me re axiv.

**‘Vejînkirina rihê çandiniyê’**

Axîn Abdullah da zanîn ku Kompiratîfên çandiniyê hatin avakirin bi armanca komkirin û bi rêxistin kirina jinan, ji ber ku çandinî bi destê jinan hatibû avakirin û wiha got: “Aboriya jin dest bi xebatê kir da ku jin careke din tevlî civakê bibe û bi xweseriya



xwe çandiniyê bike dako berhemeke baş derxîne holê. Di destpêkê de jinê gelek zehmetî dîtin ji ber ku dûrî keda xwe ketibû, a ku bi hezarê sala bi saya wê hatibû avakirin. Lê bi demê re jinê bi sekin û îradeya xwe karî vê yekê derbas bike. Aboriya jin her sal çandiniyê dike, ji bilî zeviyên kompiratîfê, zeviyên komîteya aboriya jin bi xwe jî hene piştî çandinî diqede pereyên ku qezenc dikin pêdiviyên xwe û alavên nû pê dikirin da ku sala din bi awayekî hêsantir kar bikin. Aboriya jin bixwe karê xwe bidestê xwe dike di milê çandiniyê de çi li mîrayê çi jî di nav zeviyan de. Dema em kompiratîvan jî çêdikin em bi wan kesan re dibin alîkar da ku astengî li mîrayê bi wan re dernekeve, ji ber ku armanca me ya bingehîn vejîn kirina rihê çandiniyê li cem jinê ye. Her du salan kesên ku cihê xwe di kompiratîvê de digrin tên guhertin da ku hamû malbat sûdê bigrin û mafê tu kesî neyê xwarin.”

**Projeyên Aboriya Jin**

Rêvebera Aboriya jin li bajarê Dêrikê Axîn Abdullah axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: “Kompiratîv tê wateya kombûna jinan ji gund û bajaran da ku bi yek destî kar bi rêve bibin. Aboriya jinê gelek pirojeyan birêve dibe û destekê dide malbatan ku cihê xwe di nav pirojeyên wê de bigre. Yek ji pirojeyên wê xwaringeha Hêvî li



deriyê fîşxabore 4 jin cihê xwe tê de digrin, firingeha Adar jî heye 5 jin têde kar dikin nanê stûr û yê sêlê çêdikin. Di heman demê ofîsa Hîzil li deriyê Fîşxabûr heye ji bo serifkirina dolar ew jî girêdayî aboriya jinê ye. Îsal jî 4 kompratîv di nav destê me de hene, kompiratîva Teqil Beqil 50 malbat cihê xwe têde digrin, kompiratîva Zihêriyê 17 malbat cihê xwe têde digrin, kompiratîva Girkendal 3 malbat cihê xwe têde digrin û kompiratîva Pilêsiyê 13 malbat cihê xwe têde digrin. Di heman demê de aboriya jinê hertim di nav tevger û pirojeyan deye, yek ji pirojeyê wê ku li gundê Melemerzê 3 hezar darên meyweyan çandine, dema ev dar bibin xwedî berhem êdî wê aboriya jinê van daran bike kompiratîv. Di dema pêş de em dixwazin hemû pirojeyên xwe bikin kompiratîv da ku herkes ji van pirojeyan sûd bigre û li wan xwedî derkeve.”

# Ji bo zêdekirina qadên kesk Desteya Jîngehê projeyên xwe firehtir dike

**Navenda Nûçeyan**

**Hevseroka Meclisa Jîngehê li kantona Cizîrê Rovend Rustem Ebdo da zanîn ku projeya darçandinê li perstgeha Çiyayê Kezwanê di salên bê de wê berfirehtir bibe û got, “Ev proje wekî qonaxa yekemîn e û di salên bê de wê sîstema ewlehiyê û zêdekirina qadên kesk berfirehtir be.”**

Desteya Jîngehê ya Kantona Cizîrê di çarçoveya hewildanên ji bo parastina qadên xwezayî û zêdekirina şînatiyê de, dest bi projeyeke nû ya darçandina li Herêma Parastî ya Çiyayê Kezwanan bi navê Daristana Şehîd Ehmed Mihemed, kir. Di projê de hezar dar di hundirê herêmê de hatin çandin.
Di çarçoveya planên Desteya Jîngehê de ku armanc dike qadên kesk berfireh bike, perestgehên xwezayê biparêze û pêkhateyên cûda yên civakê di hewldanên jîngehê yên domdar de beşdar bike, projeyeke çandina daran li Perestgeha Çiyayê Kezwan vekir.

**Proje destekê dide jinûve vejandina rûberên şînatiyê**

Giringiya vê projeyê di warê jîngehê de mezin e ji ber ew destekê dide jinûve vejandina rûberên şînatiyê yên ku zerar dîtine, hevsengiya jîngehê diparêze û pirrengiya jiyanî li herêmê, xurt dike.
Di vê derbarê de Hevseroka Meclisa Jîngehê li kantona Cizîrê Rovend Rustem Ebdo ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku ev proje ji projeyên desteyê li kantona Cizîrê ye û wiha berdewam kir: “Armanca projeyê ew e ku ji bo ku sîstema ewlehiyê ya perestgehê baştir bike di riya dabînkirina karavan. Herwiha zêdekirina qadên kesk û windabûna nebatan ji ber êrişên ku li ser hatin kirin, telafî bike, di heman demê de çareserkirina pirsgirêka guherîna avhewayê, germbûna gerdûnî û çolbûn li herêmê, di rêya çandina 1000 daran li perestgehê wekî gaveke yekemîn di sala 2025’an de.”

**‘Sîstemeke avdanê hat dabînkirin’**

Ev însiyatîf di çarçoveya stratejiya desteyê de ye ku armanca wê zêdekirina rûberên şînatiyê herêmên xwezayî ye herwiha xebatên ji bo avakirina bendên



stratejîk ên ku bi av û enerjiya rojê ve hatine sazkirin li perestgehên cûda têne meşandin da ku domdariya wan were misoger kirin.
Rovend Rûstem Ebdo wiha anî ziman: “Di rêya kolandina bîrekê ku li ser enerjiya rojê dixebite, sîstemeke avdanê ji bo daran hat dabînkirin, wekî din peydakirina tankerekê ji bo gihiştina darên herî dûr ên hatin çandin, hatiye misogerkirin.”

**1000 darên ji cureyên gunvac hatin çandin**

Di projeyê de hezar darên ji cureyên guncaw hatin çandin, weke hewldanên têkoşîna li dijî çolbûnê, kêmkirina bandorên guherîna avhewayê û parastina hebûnên biyolojîk.
Hevseroka Meclisa Jîngehê li kantona Cizîrê Rovend Rustem Ebdo wiha anî ziman: “Darên ku hatin çandin Kezwan, darên marxê û fisteq Helebî ne. Ji nû ve darçandina perestgehên xwezayî û peydakirina xalên çavdêriyê ji îstratîjiyên deste û meclisa jîngehî ya kantona Cizîrê ye. Ev proje wekî qûnaxa yekemîn e û di salên bê de wê sîstema ewlehiyê û zêdekirina qadên kesk berfirehtir be, di heman demê de vegerandina hevsengiya biyolojîk û ekosîstemên vê parastgehê.”
Hevseroka Meclisa Jîngehê li kantona Cizîrê Rovend Rustem Ebdo wiha gotina xwe qedand: “Armanca me ya sereke ku êrişên li ser perestgehê bê sekinandin, weke qutkirina darên kesk, bazirganiya wan, zêdeçêrkirin û nêçîra sewalan di vê perestgehê de ye.”



# Rêveberiya Xweser ewlebûn ava kir, hikumeta veguhêz êriş pêş xist

**Nûnerê Rêveberiya Xweser a li Welatên Kendavê Sîhanok Dîbo diyar kir ku piraniya gelên Sûriyê şêwazê Rêveberiya Xweser erê dike, wekî Sûriyeke nenavendî, demokrasî, pirrengî ku îradeya gel û pirrengiya wê misoger dike û got, “Ger sererastkirinek ji aliyê hikumeta veguhêz neyê kirin, wê hemû rê li pêşiyê bê girtin."**

**Ronahî Sadûn**

Derbarê ezmûna Rêveberiya Xweser a zêdeyî 11 salan, Nûnerê Rêveberiya Xweser a li Welatên Kendavê Sîhanok Dîbo bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Ev zêdeyî 11 salan Rêveberiya Xweser ezmûneke serkeftî bi dest xistiye, hûn vê ezmûnê çawa dinirxînin?**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 11 salan li pey xwe dihêle. Di destpêka aloziya Sûriyê de Rêveberiya Xweser xwe wekî formêla çareseriya pirsgirêka Sûriyê, diyar kir. Ew jî di her du milên xwe de, di milê yê ku wekî sembolek dijî rêxistinên tundirew mîna DAIŞ’ê, El-Qaîde, herwisa ew girop û çeteyên tundrew ê pê ve girêdayî ye û temamê îslama siyasî. Ev gavekî ji bo Kurdan taybet li ser destê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û dûvre temamî QSD’ê sembolekî mezin bû. Di milê din de jî Rêveberiya Xweser ew bingeha guhertin û veguherîna demokratîk a gelên Sûriyê ku di Adara 2011’an de rabû ku gel guhertinê dixwaze, niha guhertina gel di vê qonaxê de ew formêlekî wê yê çareseriyê ye. Dema gel şoreşa xwe li Sûriyê lidar xist, bingehekî wê yê guhertinê yê sereke hebû, ev guhertin jî Rêveberiya Xweser bû ku îro roj piraniya gelên Sûriyayê şêwazê Rêveberiya Xweser erê dike, wekî Sûriyeke nenavendî, demokrasî, pirrengî ku îradeya gelên Sûriyayê û pirrengiya wê misoger dike, li gorî hevpeymanekî civakî nû. Herwiha piştî serrastkirin kêmasiyên




ku derdikeve, di aliyê Rêveberiya Xweser de, ew mînakeke ji bo çareseriyê ye. Di aliyekî din de jî ji bo hêzên demokrasiyê mafê jinê parastin, civakek exlaqî û polîtîkî, ev hemû jî Rêveberiya Xweser wekî ezmûnekî ji bo hemû gelên Sûriyê û gelên herêmê, heta di cîhanê de jî li gorî felsefeyekî xwe dispêre felsefa Jin, Jiyan, Azadî. Ev her sê aliyên sereke ku îro xetmandinekî di pirsgirêkên siyasî û bingehîn ên navnetewî de jî xwe derxistiye. Em karin bibêjin Rêveberiya Xweser ji bo hemû aliyan çi di milê Kurdistanî, Kurdî, Sûrî û heta Rojhilateke Navîn nû de jî li ser bingehê konfedraliya demokratîk, karîbû bibe bersiv.

**Ev saleke ku hikumeta veguhêz hatiye ser desthilatdariyê, ev desthilatdarî bi kiryarên ku li ser gelên Sûriyê pêk tîne, dixwaze destkeftiyên Rêveberiya Xweser têk bibe, hûn li siyaset û nêzîkatiyên vê desthilatdariyê çawa dinirînin?**

Derfetekî mezin li pêşiya hikumeta demikî ya ku cihê xwe li Şamê digire, vebû, ev piştgirî jî ne tenê ji milê hin welatên xwedî hêzê yên cîhanî ne, lê welatên derdorê yên Erebî û herêmî jî ji vê hikumeta demikî re derfeteke mezin bû. Her kes pir bi erênî ji bo rûxandina rejîma desthilatdar a Baasê nêz bû, ev ji bo me taybet gelê Kurd li Sûriyayê û hemû gelên herêmê jî derfeteke mezin e.
Lê kiryarên hikumeta demikî ji bo gelên Sûriyayê, kiryarên di milê şaş de dimeşe, ger serrastkirinek çênebe di vî milî de û bi berpirsyarî li rêkeftina 10’ê Adarê ne nere, ev hikumeta demikî wê gelekî demikî be, wê tê de xuya bike ku hinek gurevên pêk werîne û derfet li pêşiya wê bê girtin. Carekî din em dibêjin rêkeftina 10’ê Adarê tevî ku hin kiryarên diyaloga niştîmanî Sûrî, piştre ragihandina destûrî û hikumeta berfireh hate avakirin di bin vî navî de, di demên dawiyê de jî parlemeterk şeklî hate avakirin, di baweriya me de ev hemû jî ne alîkarin bi vê rêkeftinê re. Ji bo wê guhertineke cidî ji vê mijarê re pêwîst e. Ger hikumeta demikî xwe nebînî berpirsyar û aliyek ji bo serrastkirinê û kiryaran berdewam bike, wê temenê wê jî gelekî kurt be. Îro roj gelên Sûriyayê çavên wê li Rêveberiya Xweser e ku bibe mînak û nimûneyek ku li ser Sûriyê hemû were pêkanîn.

**Gelo ezmûna Rêveberiya Xweser ji bo giştî Sûriyê çawa ye?**

Ger rafirandomek li ser asta Sûriyê giştî were pêkanîn, wê piraniya gelên Sûriyayê bi hemû pêkhateyên wê mînaka Rêveberiya Xweser erê bike. Rêveberiya Xweser ezmûna herî girîng e ku îro hemû aliyên Sûrî û îradeya gelên Sûrî temsîl dike. Ji bo wê em dibînin ew derfet li pêşiya Rêveberiya Xweser heye ku bibe




nimûna ji Sûriyê re. Taybet nirxandina hin aliyên navnetewî êdî sar dibe ji milê hikumeta demikî ku hesabê xwe berçav digirin, beramberî wê jî ger Rêveberiya Xweser nebe jî, berê Sûriyê li şerekî xwecihî ye, ew jî dibîne hikumeta demikî bi naveroka xwe ya îslama siyasî dibîne Rêveberiya Xweser wekî kelemek li pêşiya wê yan jî astengiye li pêşiya projeyên îslama siyasî. Sûriyê, herêm û cîhan bi giştî di qonaxekî veguhêz re derbas dibe. Lewra li gorî şert û mercên îro ku derbas dibe, ne mûmkin û hesane ku çareyeke mayînde peyda bibe, îro dibe ku bêtir rê li pêşiya guhertinan vedibe, guhertinên cedî heta bandorekî wê bighêjê û reflêksiyonekî wê li ser nexşeyên Rojhilata Navîn giştî de bike.


**Di dawiyê de bangewaziya te ji bo avakirina Sûriya ku li gorî ku tê xwestin çi ye?**

Banga me li hemû pêkhateyên Sûrî, hêzên demokrasî û Meclisa Ewlekarî ya navdewletî ku helwestekî cidî were standin. Sûriyê îro hemû dikeve bin sîwana Meclisa Ewlekarî, lewra gereke êdî nêzîkbûnekî cidî û berpirsyarî tê de were pêkanîn. Hem jî rê li pêşiya giropên tundrew, nêzîkatiyên dijminatî û hovanatî ku ji bo pêkhateyên Sûriyê giştî radibe, bigire. Ev xîtaba nefretê jî were rawestandin. Di heman demê de bangewaziya me piştgiriyeke cidî çêbibe ku ev rêkeftina 10’ê Adarê pêk were bi xwendinekî saxlem û bi hevdure girêdayî be ku ne bibe alîkarî ji bo rê veke li pêşiya projekî reş ku îrada gelên Sûriyê tê çewisandin. Sûriyê çênabe gorî aliyekî yan jî gorî îdyolojiyeke bimeşe, îro ew derfet li pêşiya biratiya gelan, netewên demokrasî û Rêveberiyên Xweser di Sûriyê de heye û vekiriye.

# Pakîze, Sêvê û Fatma bûn mînaka jinên azad

**Arîn Koçer**

daye xwe biparêze, xwedî li xweseriya xwe derkeve û vîndariya xwe bide raber kirin. Lê her carê jî gelê me rastî êrîşên neyar ên herî tundrew û zalim tê. Êrîş her tim bi armanca tinekirinê ne. Ev rêbaz heya roja me ya îro jî berdewam dike.
Di navbera 2012-2015’an de pêvajoya çareseriyê ya ji bo çareserkirina meseleya Kurd hatibûn destpêkirin. Lê belê desthilatdariya heyî ev pêvajo bi dawî kir. Dîsa polîtîkayên tesfiyekirinê û qirkirinê kir meriyetê. Bi van polîtîkayan li bajarên Bakurê Kurdistanê li hember gel, jin û ciwanan êrîşên dijwar çêbûn. Di wan êrîşan de bi sedan kesî jî jiyana xwe ji dest dan.
Ciwanên Kurd bi rihekî serhildêr bersiv dan van êrîşan û li ber xwe dan. Di wan êrîşan de ji pitikên sê mehî heya mirovên temenmezin, hatin qetilkirin. Cenazeyê dayika Taybet li Silopiyayê heft rojan li nav kolanê ma. Selman Agar ê 10 salî jî li Cizîrê hat qetilkirin. Di navbera 4-12’ê Îlona 2015’an Cemîle Çagirga ya 10 salî li şaneşîna mala xwe hat qetilkirin. Dayika wê ji bo cenazeyê wê ji bo bêhn nede kiribû sarincê.
Endama Meclîsa DBP’ê Sêvê Demîr, Hevseroka Meclîsa Gel a Silopiyê Pakîze Nayir û aktîvîsta jin Fatma Uyar 4’ê Çileya 2016’an di dema qedexeya derketina derve de hatin qetilkirin. Siyasetmedarên jin ên di heman demê de ji bo nirxên, mirovatiyê xebat dikirin rastî guleyên hêzên dewleta Tirk hatin. Jinên li dijî neheqiyê serî natewînin wekî her carê vê carê jî bûbûn hedefa yekem. Jinên têkoşer, lêgerên heqîqetê Sêvê, Pakîze û Fatma bûn sembola jinên berxwedêr a pêvajoya berxwedana xwerêveberiyê.
Gelek dayikan navê Sêvê, Pakîze û Fatma li zarokên xwe kirin. Wan li dû xwe berxwedaneke mayînde hiştin. Sekna wan a xurt di heman demê de li dijî bêdengiya cîhanê ya li hember zilm û zordestiya li ser gelê Kurd bû. Hedefgitina her sê jinên siyasetmedar hedefgirtina îrade û berxwedana gelê Kurd bû. Mîna pêşenga Tevgera Apoyî Sakîne Cansiz, şoreşgera ciwan Leyla Şaylemez û lehenga dilsoz Fîdan Dogan ên 9’ê Çileya 2013’an li Parisê hatin qetilkirin, Sêvê, Pakîze û Fatma jî ji hêla heman hişmendiya nemerd a dijminê jinên azadîxwaz ve hatin qetilkirin.
Ev ne tesaduf e ku di şexsê jinê de kevneşopiya têkoşîna gelê Kurd a bi salan tê hedefgirtin. Jinên têkoşer her dem çavkaniya hêzê û bingehê referansa civakî ne. Jiyana xwe dispêre hêza jinê li dijî hemû amûrên îdeolojîk ên sîstemê alternatîfeke xurt e. Sêvê, Pakîze û Fatma bi têkoşîna



xwe pêşengiya vê alternatîfa xurt dikirin. Li ser bingehekî rast ê xwe ji paradîgmaya Rêber Apo xwedî dike tevdigeriyan. Ne li gor pîvanên sîstema xwînxwar û yekperest, berevajî li gor pîvanên exlaqî, wekhevî û rûmeta mirovatiyê têkoşîn kirin û li ber xwe dan.
Perspektîfa jina azad û jiyaneke azad esas digirtin. Li ser vî esasî li jiyanê xwedî derdiketin. Li hember nêzîkatiyên jiyana hevpar têk zeîf dikin û polîtîkayên şerê taybet xwedî dikin jî berxwedaneke herî esîl meşandin. Ev her sê xwedawend bûn mînaka jina azad. Di şexsê her sê xwedawendan de Hevserokên Meclîsa Gel a Cizîrê Mehmet Tûnç û Asya Yuksel û tevahî şehîdên berxwedana xwerêveberiyê bi rêzdarî bi bîr tînin. Em ê armancên hevrêyên me di oxira wan de çûn şehadetê misoger bînin cih.

# ‘Wê Mesar Demokratîk xebata niştîmanî li hundir û derveyî Sûriyê bimeşîne’

**Fewzî Şengalî da zanîn ku Kongreya Riya (Mesar) Demokratîk a Sûrî wê xebata niştîmanî li hundir û derveyî Sûriyê bimeşîne û got, “Piştî rûxandina rêjîma Baas giranî ket xebata me. Di sala nû de wê civatên me bên lidarxistin, lê merca yekem divê kîndarî û kuştina li ser nasnamê bi dawî bibe."**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**



Kongreya Riya Demkratîk a Sûrî di 25 û 26’ê Cotmeha sala 2024’ de li paytexta Belçîkayê Brukselê hat lidarxistin. Herwiha 128 kes ji hundir û derveyî Sûriyeyê tevlî vê kongreyê bûn, ji wan kesên ku amade bûn, gelek siyasetmedar ji hemû pêkhateyên Sûriyê û kesên biyanî bûn. Bêtirî 100 kesî tevlî kongeyê bû, herwiha gelek kesên din bi riya zomê beşdar bûn. Di nav van delegeyan de Kurd, Ereb, Suryan, Aşûr, Turkmen, Durzî, Ewlewî û hwd… hebûn. Piştî rûxandina rêjîma Baas, êdî reşa siyasî ya hundir û rewşa xebata diplomatîk derbatsî qonaxeke nû bû.

Têkildarî xebata Kongireya Riya Demokratîk a Sûrî, endamê Desteya Giştî ya Riya Demokratîk a Sûriyê Fewzî Şengalî ku yek ji endamên vê kongreyê ye ji rojnameya me re axivî.

**‘Kongreya Riya Demokratîk li ser bingeha armancên xwe xebitî’**

Fewzî Şengalî diyar kir ku Kongreya Riya Demokratîk a Sûriyê li ser nîqaş û armancên çar civînên Stokholmê dixebite û wiha got: “Ji sala 2021, 2022 û 2023’an ve bi taybet çar civînên Stokholmê li dar diketin, di encama guftûgoyên di wan civînan de bû bingeh ji bo avakirina Kongreya Riya Demokratîk. Vê kongreyê tekezî li ser nîqaş û xalên girîng kirin, yek ji van xalan ew e ku destûra Sûriyê were guhertin, axa Sûriyê yek be, çareseriya kirîza Sûriyê li gorî pîvana navnetewî ya 2254’an be ku wê qonaxa veguhêz a hikumetê bi çi rengî be û rewşa siyasî ya Sûriyê wê çawa be. Di heman demê de desthilatdara cîbicîkar ji desthilatdara hiqûqî, dadwerî û teşrîî ji hev cuda bibin, hem jî azadiya gotin, nivîsandin û ya siyasî çêbibe. Herwiha misogerî li ser mafê hemû pêkhateyan were kirin. Sûreyeke nenavendî_demokratîk_pirreng were avakirin. Kongreya Riya Demokratîk a Sûrî, serweriya Sûriyê tiştekî sereke dibîne. Ew nîqaş û guftûgoyên ku çêbûn êdî çawaniya guhertina ji warê diyalogê ber bi pêngava xebata rêxistinî û piratîkî ve, pêkhat. Piştî mehekê ji avakirina Riya Demokratîk a Sûriyê rêjîma Baas têkçû.”


**‘Piştî rûxandina rêjîmê, giranî di xebata Riya Demokratîk de çêbû’**

Şengalî da zanîn ku piştî rûxandina rêjîma Baas giranîn ket xebata Riya Demokratîk û wiha doman: “Bi ketina rêjîma Baas re hêviyên me hemûyan ew bû ku sîstema dîktator û serdest here û li şûna wê sîstemeke demokrat ku mafê hemû pêkhateyan biparêze, were. Lê bi hatina hikumeta nû re, ev hikumet ne li gorî hêviyên wesîqe, nîqaş û xalên Riya Demokratîk a Sûriyê bû. Me dît ku serokê vê hikumeta veguhêz ji aliyê HTŞ’ê ve hat bijartin, wan bi xwe ev yek pêkanî. Di heman demê de parlmanan û destûra Sûriyê bi rêbazekî yekalî hatin çêkirin. Diviyabû ku biryar û xalên kongreya me di ber çavan re bihata derbaskirin û li gorî wê Sûriyeke demokratîk bihatiba avakirin. Lê pêkanîna xalan giranbûn çêbû, giranbûna avakirina Sûriyeke pirreng, hevbeş û yeksînor, hem jî mafê hemû pêkhateyan misoger bibe, pêkdihat. Vê giranbûnê jî bandor li kar û xebata Riya Demokratîk a Sûriyê kir. Hîna Dektatorî û paşguhkirin li ser pêkhateyên Sûriyê berdewam e. Tirsa pêkhateyên Elewî, Durzî, hem jî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji vê hikumeta nû heye. Rêjîmeke dîktator çû, sîstemeke olî hat, di heman demê de hegemonî û hîna ferdiyet ji hêla rêxistineke olî heye, pêkhateyên Sûriyê jî ji derve dimîne. Em weke Mesar Demokratîk a Sûriyê, vê yekê tiştekî xeternak dibînin, herwiha tevahiya aliyên Sûriyaya demokratîk û hêzên ku doza Sûriyeke ilmanî dikin, xwedî hêviyekê ne ku ew ê Sûriyeke pirreng û demokras ava bibe.”

**‘Kongreya Riya Demokratîk wê civatan li dar bixe’**

Endamê Desteya Giştî ya Riya Demokratîk a Sûriyê Fewzî Şengalî eşkere kir ku Kongreya Mesar a Demokratîk wê civatan li hundir û derveyî Sûriyê li dar bixe û wiha bi dawî kir: “Dema ku Mesar Demokratî ya Sûrî hat avakirin, rêjîma Baas li Sûriyê li ser piyan bû, xebata di hundirê Sûriyê de pir zehmet bû. Lê di dema heyî de derfeta xebatê ji berê bi heya astekê baştir bûye. Piştî salek li ser hatina hikumeta nû derbas bû du civatên me hatin lidarxistin, me nîqaşa vê yekê kir ku rêjîm guherî, lê tiştek di warê partîkê de pêknehat, berevajî vê yekê em îro nizanin ku wê rewşa Sûriyê ber bi ku ve diçe. Civateke me li Qamişlo li dar ket û civateke din bi riya onlynê çêbû, herwiha ji hundirê Sûriyê tevlî bûn. Di roja îro de hîna rewşa Sûriyê weke xwe ye, hîna tevlîhevî û bêaramî heye, eger hikumeta nû li ser hişmendiya xwe bimîne û guhertinekê ava neke ku mafê tevahiya gelên Sûriyê di destûreke hevbeş de di hundirê Sûriyeke demokratîk de misoger bike, wê demê em vê qonaxê xeternak dibînin. Li ser asasê Sûriyeke nenavendî, sivîl, ilmanî em ê di sala nû de civatên xwe li dar bixin, pêwîste Kongreya Riya Demokratîk li hundirê Sûriyê bibe bilokeke siyasî xebatê bimeşîne, di dema pêş de derfeta xebatê li pêş me vekirî ye, em ê li herêmên hundir ên Sûriyê, hem jî li derveyî Sûriyê ji bo Sûriyeke niştîmanî ya nenavendî ku nasnameya hemû gelan biparêze. Lê divê di serî de ev şerê kîndariyê û kuştina li ser nasnamê were rawestandin da ku Mesar bikaribe projeya xwe ya Sûrî-niştîmanî û demokrasiyê pêkbîne.”

## Saleke Nû Bi Rojê re



**Sînan Cûdî**

Dema ku em sala 2025 an li dû xwe dihêlin, ez dikarim vê yekê bi zelalî bibêjim: Tiştê ku îsal qewimî ne şikestinek bi serê xwe bû û ne jî tenê berdewamiyek bû. Ew bêtir dişibiya bergiriyekê ku me giraniya tiştê ku em demek dirêj e dijîn fêm kir. Ev ji bo Rojava û her weha ji bo çîroka me ya takekesî û kolektîf jî rast bû.
Jiyan îsal li Rojava berdewam kir.
Ez bi taybetî bi vî rengî dibêjim ji ber ku berdewamkirin ne tiştek e ku bi awayekî xweber çêdibe. Xebata saziyan, civîna encumenan, rêxistina berdewam a jinan, berdewamiya perwerdehiyê, herikîna jiyana rojane; yek ji van jî ne otomatîk e. Ew pêvajoyên ku bi rêya biryargirtina domdar têne kirin bûn. 2025 salek bû ku ev biryar bi bêdengî lê bi israr hatin girtin.
Şikestinên leşkerî yên mezin tune bûn. Gav avêtinên siyasî yên mezin jî tune bûn. Em dikarin bibêjin ku ew demek bû ku bi nezelalî û sekinandinê serdest bû. Lê ev sekinandin ne cemidandin bû. Ew bêtir pêvajoyek zelalkirinê bû ku her kesî dît ku ew dikare çi tehemûl bike û ew êdî nikare çi tehemûl bike.
Îsal, Rojava li şûna ku xwe ji cîhana derve re rave bike, xwe ji hundir ve ji nû ve nirxand. Kîjan sazî bi rastî dixebitin, kîjan refleks bûne adet, kîjan gotar hîn jî deng vedidin? Ev ne pirsên romantîk bûn. Ew pirsên pir şênber û bi jiyanê ve girêdayî bûn.
Ji bo min, sal di serdemek wisa re derbas bû. Salek bû ku min dûrbûna xwe ji nû ve rast kir dema ku dinivîsim, hilberînim û şahidiyê dikim. Min hewce nedikir ku tiştê ku diqewimî nerm bikim an xemilînim. Min li zimanekî rasterasttir û hêsantir geriyam. Ji ber ku ez difikirim ku êdî dem tune ku meriv li dora tiştan de biaxive. Em tev şahidê jîyana xwe ne. Lê ev şahidî ji tomarkirinê bêtir li ser girtina berpirsiyariyê ye. Ew berpirsiyariyek mezin e ku tê de jiyan û nivîsandina dîrokê bi hev ve girêdayî ne.
Di seranserê sala 2025-an de, min ev yek zelaltir dît: Em hemî di heman demê de gelek bar hildigirin.
Yên ku li Rojava dijîn vê yekê rasterast tecrûbe dikin. Yên li derve bi awayên cûda hîs dikin. Westiyayî heye, lê hilweşîn tune. Rexne heye, lê bêhnvedan tune. Ev ne rewşek qelsiyê ye. Ev encama xwezayî ya şêwazek têkoşînê ya demdirêj e.
Hûn nekarin bi motîvasyonek bilind a domdar bijîn. Ne jî hûn dikarin bi zimanek krîzê ya domdar siyasetê bikin. Me ev yek îsal zelaltir fêr bû.
Ez tev li wan kesên ku Rojava wekî îsal “lawazbûyî” diyar dikin nabim. Ne jî tev li wan kesên ku dibêjin “her tişt baş e” dibim. Gotinek rasttir dê ev be: Rojava niha bêyî ku xwe bixapîne, di rêya xwe de berdewam dike. Ew ne kapasîteya xwe zêde dike û ne jî kêmderfetiyên xwe dramatîze dike.
Ev rewşa gihîştinê asteke girîng e, hem ji hêla siyasî ve û hem jî ji hêla civakî ve.
Dema ku em dikevin sala 2026-an, divê em ji vir biaxivin.
Bi sloganên kêmtir, bi hewldanek zêdetir. Bi hêviyên kêmtir, bi armancên zelaltir.
Ne zimanek heye ku me ji ya ku em in piçûktir nîşan dide, ne jî geşbîniyek heye ku têkiliya xwe bi rastiyê winda dike. Pirsgirêka sala pêş de ne tenê mezinbûn e, lê hê bêtir, kûrbûn e.
Di saziyan de, di nivîsandinê de, di siyasetê de, di têkiliyan de.
Vê salê ev fêrî me kir: Berdewam biryarek e ku her roj ji nû ve tê dayîn.
Em bi vê hişmendiyê dikevin sala 2026an. Dibe ku ev ne wekî daxuyaniyek bi idîa xuya bike. Lê bê guman, ew encamek hêsan e ku ji ezmûnên me tê derxistin.
Lê em di heman demê de dizanin ku sadebûn xelatên mezin tîne, û ku kesê herî bihêz ew e ku bi wate û hestê tijî ye. Di dawiyê de, roja me me hemûyan ronî dike û xwedî dike...

# Li Îranê di xwepêşandanan de 8 kesan jiyana xwe ji dest dan

**Navenda Nûçeyan**

**Di protestoyên gel yên ku Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ji ber krîza aborî ji heft rojan ve hatiye destpêkirin de, ji aliyê dewletê ve zarokek û 7 kesan jiyana xwe ji dest dan.**



Li Îranê protestoyên ku ji aliyê esnafên Sûka Tehranê ve yên li hemberî kêmbûna nirxê riyalê ya li hemberî dowîzê û zêdebûna buhayê tiştan hate destpêkirin, li seranserê welêt belav bûn. Protestoyan li bazara telefonên bêrîka dest pê kir, piştre belav bû bajarên weke Karac, Şîraz, Îsfehan, Meşhed, Kirman û Keşmê û di rojên dawîn de li zanîngehan jî protesto tên lidarxistin.

Piştî ku li zanîngehan jî protesto hatin lidarxistin Serkkomarê Îranê Mesut Pezeşkiyan duh daxuyaniyek da û di daxuyaniya xwe de diyar kir ku zanîngeh û saziyên dewletê bi hinceta ‘’teserûfa enerjiyê’’ demkî hatine girtin.

Li Îranê ku enflasyon gihîştiye ji sedî 52’yan û riyal li hemberî dolarî daketiye asta 1 milyon 400 hezarî, navên kesên ku di protestoyên ku ev şeş roj in berdewam dikin de jiyana xwe ji dest dane hatin eşkerekirin. Li gorî vê yekê; Li bajarê Fuladşehir ê Îsfahanê Daryuş Ansarî Bahtiyarvend (37), li bajarê Kuhdeşt ê Lorestanê Emir Hesam Hudayariferd (22), li bajarê Eznayê Şayan Esedullahi (28) û Mustafa Fallahi (15), li Çarmahal û Lordegana girêdayî Bextiyariyê Ahmed Celil (21) û Seccad Valameneş Zilayi (28) û li bajarê Mervdeşt ê girêdayî eyaleta Fars jî Xodadad Şirvani jiyana xwe ji dest dane.

Fikar hene ku hejmara kesên jiyana xwe ji dest dane zêde bibin û hate ragihandin ku di çarçoveya protestoyan de heta niha 29 welatî hatine binçavirin.

Di protestoyan de li gel daxwazên aborî li dijî zexta polîtîk a li welêt zêde dibe jî nerazîbûn hatin nîşandan. Hate ragihandin ku dirûşmeyên di pêvajoya ‘’Jin, Jiyan, Azadî’’ ya piştî qetilkirina Jîna Emînî hatin destpêkirin de yên weke ‘’Ji dîktatorî re mirin’’, ‘’Netirsin em hemû bi hev re ne’’ û ‘’Ne Xeze ne Libnan ez ê xwe ji bo Îranê feda bikim’’ di protestoyan de hatine berzkirin

**TRUMP: EM AMADE NE MUDAXELEYÊ BIKIN**

Her wiha Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Donald Trump hişyarî da ku ege li dijî protestoyên li Îranê tundî were bikaranîn ew amade ne ku mudaxeleyê bikin.

Serokê DYA’YÊ Donald Trump li ser medyaya dijîtal Truth Socialê daxuyaniyek da û got: “Eger Îran guleyan berde ser xwepêşanderên aştîxwaz û wan bi tundiyê bikuje wê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê were alîkariya wan. Em amade ne, çekên me hene û em amade ne mudaxeleyê bikin.”



# Ferzkirina dorpêçê ne polîtîkayeke nû ye

**Dorpêça domdar a ku li ser her du taxên Kurdan yên Helebê tê ferzkirin, bandora xwe li ser qada perwerdê, tenduristî û xizmetguzariyê kiriye. Hevserokê Komîteya Perwerde û Hîndekariyê ya Helebê Şiyar Silêman da zanîn ku her çendî rewş zehmet bibe wê deriyên dibistanan neyên girtin.**

**Zana Roj/Heleb**



Bi berdewamkirina dorpêça girankirî ya li ser her du taxên Kurdan yên Helebê, bi tunebûna sotemeniyê ku bandora xwe li ser hemû aliyên jiyanê dike; Rewşa dibistanan û şagirtan her wiha rewşa tenduristiyê û xizmetguzariyê jî zehmetir dibe. Siyaseta ku li ser her du taxan tê birêvebirin ne siyasetekî ji rêzê ye ku tenê dixwazin tacîzan û hin rewşên tevlîheviyê derxînin, ev yek bi mabesta têkbirina îradeya gelekî tê kirin, hilweşandina destkeftiyên bi sala her wiha radestbûna gelê li wê derê ji hikumet aheyî re. Helbet ev yek li gorî xeyalên ku ew çêdikin wê nebe, evg yek jî di raberkirina helwesta ku tê derketin de, tê dîtin. Gelê her du taxan ji destpêka vê şoreşê de tenê baweriya xwe bi hêza felsefeya Rêber Abdullah Ocalan anîn û bi hêza şervan û dilê xwe anîn bûn. Ji ber wê yekê ev gel çawa ku serî ji Rêjîma Baas re danayînî, ji hikumeta veguhêz re jî danayîne.

**Dorpêç ferzkirin ne polîtîkayekî nû ya dijmin e**

Rewşa her du taxan ji demên berê de her di bin gef û dorpêçê de bû, bi hemû wesîleyên dijmirovî Rêjîma Baas hewil dida ku gel bêzar bike, ji bilî êrişên ku dihatin kirin, bi hezaran ciwanên Kurd li ser bendên kontrolê digirtin, gelek jinên ku di nava Rêveberiya Xweser de kar dikirin hatin gritin. Her wiha rêya di navber herêma Şehbayê û Helebê de heyanî demeke dirêj qutkiribûn û destur nedida ku medenî derbasî bajarê Helebê bibin. Kesên nexweş bi rêya têkiliyên di navber her du aliyan ve bi rêya nexweşxaneyê derbasî bajarê Helebê dibûn. Ambargoyeke girakirî heyanî roja ku gelê Efrîn û Şehbayê ji herêmê koçber bûne, hatibû ferz kirin. Rê nedidan ku sotemenî derbasî herêma Şehbayê û her du taxan bibe, ger bibûya jî bi xwestina pereyekî pir zêde û qismekî mezin ji sotemeniyê dihate kirin. Gelek zarok di kampên herêmê de jiyana xwe ji dest dan, ev yek bi siyaseta hişmendiyên qirêj yên ku dixwazin îradeya gelê Kurd têk bibin dihate kirin. Ji ber vê yekê siyaseta dorpêç ferzkirinê ne polîtîkayekî nû ya dijmin e.

**Heman zihniyet wê heman piratîk be jî**

Hikumeta veguhêz ew jî bi heman zihniyetê tevdigerin, ji ber ku di bingeh de nêzîkatiya li hember gelê Kurd û hişmendiya ku li ser mezin bûne ya hemûyan yek e. Ger mirovek li ser zihniyete ku Kurd dijminê te ye hatibe mezinkirin li Bangladêş be jî, wê bi heman fikarê nêzî te bibe. Ji lewra wî nêzîkatiyên hikumeta heyî ji yên dijmin û dijberên gelê Kurd yên din ne cudatir be, hele hele zihniyeta olperest a ku ew dipejrînin. Wê ne tenê armanca wan têkbirina îradeyê be, armanca wan li ser tunekirin û qirkirina gelê Kurd e. Ev yek jî me di êrişên xwe yên li ser herêma Şehbayê de dît.

**Hewildan û hevpeymanên çareseriyê, qezenc nekirin**

Di destpêka qonaxqa nû ya ku Sûriyê ketiyê de, gelek hewildanên HSD’ê çêbûn ku pêvajoyê derbasî qonaxa lihevkirin û aştiyê bi hikumeta veguhêz re hate kirin. Li ser wê bingehê jî gelek hevdîtin û rûniştandin hatin kiri. Ji wan jî peyman 10’ê Adarê ya di navbera Rêveberiya Xweser û Hikumeta veguhêz de hatibû îmzekirin. Her wiha bi taybet ji bo rewşa Helebê û parastina xwesertiya wî gelê li wê derê ku çawa her du tax ew jî perçeyek ji xaka Helebê ne, Hevpeyana 4’ê Nîsanê yê du navbera Meclisa Taxê û Rayaderên Helebê de hate îmzekirin. Rûxmî van gavên fermî û hewildanên avakirina çareseriyeke mayînde ji bo aştî û demokratîkbûyîna Sûriyê, lê ya berbiçav ev e û tu gavên bingehîn yên her du peymanan piratîk nebûn. Bi avakirina xweseriya her du taxan ku piştî şer û pêvajoyeke pir giran hate bidestxistin, sîstema perwerdeyê jî li gorî paradîgmeya Neteweya Demokratîk xwe birêxistin kir. Li kêlek dibistanên rêjîmê dibistanên Kurdî jî hatin vekirin, her wiha di dibistanên taxê de perwerdehiya rêjîmê hat berdewamkirin û zimanê Kurdî jî lê hat zêdekirin. Bi vî awayî xwendekarên taxê xwendina xwe berdewam dikin. Di van demên dawiyê de bi ferzkirina dorpêça dijmirovî ya ku bandora xwe li hemû aliyên jiyana gel kiriye, xwendina şagirtan û sîstema xwendinê jî pê bandor dibe. Di van rojên sermayê de û tunebûna sotemeniyê rewşeke zehmet li ber mamoste û şagirtan avakiriye. Ev yek bi serê xwe kiryareke li dijî pîvanên parastina mafê zarokan û xwendekaran e. Helbet ji vê rewşê bandorker ne tenê dibistan in, di heman demê qada tenduristî û xizmetguzariyê ye jî. Lê rûxmî hemû polîtîkayan jî berxwedana herhayî tê domandin.

**‘Her çendî rewş zehmet bibe wê deriyên dibistanan neyên girtin’**

Girêdayî rewşa dawiyê yê dibistanan bi taybet li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, Hevserokê Komîteya Perwerde û Hindekariyê ya Helebê Şiyar Silêman ji Rojnameya me re da zanîn ku di hundir her du taxan de 18 dibistan bi hejmara 25 hezar xwendekar hene. Her wiha pênc baxçeyên zarokan hene. Ji wan dibistanan jî çar dibistan girêdayî Rêveberiya Xweser in ku tê de tenê minhaca Rêveberiya Xweser tê xwendin a ku her du zimanên Erebî û Kurdî esas digre. Her wiha diyar kir ku piştî dorpêça dawiyê hikumeta veguhêz rê nade sotemenî û pirtûk derbasî taxê bibin. Ev rewş li ser hatina xwendekaran ji dibistanê re di sermayê de debandor kiriye.

Her wiha Mamoste Şiyar tekez kir ku her çendî rewş zehmet bibe jî lê wê deriyên dibistanan neyên girtin û xwendekar wê xwendina xwe berdewam bikin, da ku aliyên dijber neghînin armancên xwe.

# ‘Bi ruhê komînal em ê her tim bajarê xwe paqij bikin’

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Rêveberê Beşa Paqijiyê ya Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo Mihilî Eqîl diyar kir ku ew her tim bi pêngavên paqijiyê radibin û wiha got, “Bi rihê komînal em ê her tim bajarê xwe paqij bikin, em bi hêvî ne ku gel jî bi me re bibe alîkar da ku bajarê me paqij bimîne.”**

Beşa Paqijiyê ya Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo dest bi kampaniya paqijiyê li ser asta bajarê Qamişlo kiriye û her tim berdewam e. Armanca kampaniyê ew e ku bajar paqij bibe. Di derbarê vê mijarê de rêveberê Beşa Paqijiyê ya Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo Mihilî Eqîl ji Rojnameya me re axivî.

**‘Ji destpêka salê ve û heya niha em bi gelek pêngavên paqijiyê rabûn’**



Mihilî Eqîl diyar kir ku ji destpêka salê heya niha ew bi gelek pêngavên paqijiyê rabûn û wiha got: “Ji xwe niha her 15 yan 20 rojan em dest bi pêngava paqijiyê dikin. Niha em taxa Teyî paqij dikin, piştî ketina rêjîma Baas hinekî karê me sekiNê, lê piştî demeke kurt dîsa me dest bi kpênagav paqijiyê kir. Niha jî her heftiyekê em diçin bazara Qesaban û em wê paqij dikin ji ber ku li wê derê zêde qirêjî û bêhin ne xweş heye. Herwiha her çend rojan carekê em hîzama bakur û başûr paqij dikin. Di heman demê de jî li aliyê Rojhilat û Rojava kampaniyên me yê paqijiyê berdewam in. Ji xwe niha em xebatên sererastkirin û paqijkirinê li ser riya balafirxaniya Qamişlo, dikin. Pêngavên me yên paqijiyê bê navber dewam dikin.”

**‘Cihên qirêj zêde lê hebe em berê xwe didin wir’**

Mihilî anî ziman ku cihên zêde qirêjî lê hebe ew berê xwe didin wir û wiha bidawî kir: “Cihên ku qirêjî lê hebe û pêwistiya wê bi paqijiyê hebe em diçin wir. Kampaniyayên me yên paqijiyê li gor şopandina me li wê derê ye, carinan rojeke yan jî du rojan em paqij dikin. Ji xwe armanca ji bo paqijkirinê ew e ku em jîngeha xwe û tendirustiya mirovan biparêzin. Ji ber ku dema em bi awayekî domdar bajar paqij bikin wê herdem bajar xweşik be û rê li ber balavbûna nexweşiyên ji qirêjiyê bê girtin. Çiqasî gel di milê paqijiyê de alîkariya me bike, ewqas em ê bi rehetî xebatên xwe bidomînin û bajar paqij bimîne. Pêwîst e her mirovek li bajarê xwe xwedî derkeve û paqijiya wê biparêze.”